bas
Kurdî
Heftenameya Nûçeyî
Hejmar :01 2 - 8 Çile 2016 basnews.com



Piştî Şengalê PKK?

R02

Dr. Michael Gunter: Hewce ye kurd serxwebûnê realîze bikin

R04

Psîkolojîya civakî û kultura hakim û mehkûm li Îranê

R08

Kurd bo serxwebûnê kom bûn

"Di konfransê de gelek tişt derbarê serxwebûna Kurdistanê de hatin pêşkêşkirin û ji wan jî ew bû ku aya ew yek rîsk e yan na û aya stiqrarê vedigrîne herêmê yan zêdetir îstiqrarê têk dide. Ew dema ku em dihatin kîmyabaran kirin û dihatin enfalkirin, jixwe me daxwaza serxwebûnê nekiribû û ew hemû derbiderî û malwêranîya ku hate serê gelê me di encama daxwazkirina serxwebûnê de nebû, lê çima wê demê bi wê awayê dirindane dijatiya gelê me hat kirin?"

"Me azmûna dewleta kurdî li deverê nebûye, heta ku em bêjin sedema nebûna stiqrarê bûye, lê belê me nebûna dewleta kurdî dîtiye, ku bi xwe re heta çi qasî nexweşî û karesat ji gelê me re aniye û sedemek jî bûye bo nebûna stiqrarê li Rojhilata Navîn."

"Ti tiştek di jiyanê de nîne, ku %100 bê rîsk be, lê belê bi piştrastî rîska neserxwebûna me gelek ji wê yekê zêdetire ku em serxbixwe bin û ber bi serxwebûnê ve neçin, jiber me ew yek azmûn kiriye."

R03

Raywanêkê edebîyatî: Abdullah Çelîk

R11

Kîjan rast e? Rojava, Rojavayê Kurdistanê yan jî Kurdistana Sûriyê?

FARÛQ HECÎ MİSTEFA

R04

Îro, Ne Sibê

CIWANMERD KULEK

R13



Îmaja kurdan di dîroknigarîya dewletgerane de; Mînaka Simko

R07

Xelata Berûya Zêrîn

R12

Kurd di nav du vatişên nakok de:

Netewe-dewlet yan xweserî-kommunalîsm I

R06

Sûka Hesinkeran bar dike

Berê Sûka Paqiran ... Niha jî Sûka Hesinkeran. Ev sûka dîrokî li navçeya Sûra Amedê li cem Xana Sülüklüyê ye. Sûk bi hezaran sal berê hatiye çê kirin. Dîroka wê ne dîyar e. Hin kes dibêjin Hz. Davûd ava kiriye; hin kes jî dibêjin ewqas kevn nîne.

R09

Piştî Şengalê PKK?

MEHMED SALÎH BEDÎRXAN



Mestirîn navçeya kurdên êzdî Şengal, piştî êrîşên DAIŞê yanî ji 3ê Tebaxa 2014an ve bûye rojeva serekî ya kurdan. Bajar dikeve ser tixûbên Iraq, Herêma Kurdistanê û Rojavayê Kurdistanê. DAIŞê bi çekên giran ku ji Artêşa Iraqê bidest xistibûn, êrişî Şengalê kir. 240.000 kes jiber êrişên DAIŞ'ê neçar man ku heremê biterikînin. Roja ku DAIŞ'ê êriş kir bi dehan hezar xelkê sivîl xwe spartin Çiyayê Şengalê û zêdyî 130.000 kurdên êzdî jî li kampên Herêma Kurdistanê hatin bicih kirin. Piştî êrişên DAIŞ'ê hîn jî jî aqûbeta nêzîkî çar hezar kesan ti xeber tune. Ji van 3455 hezar kes jin û 2800 mêr in. 70.000 şengaliyan koç kir. 1800 kes hatin qetil kirin. Tenê li gundê Koço 400 kes hatin gulebaran kirin. Heta niha li 25 deverên cuda 21 gorên komî hatin ditin. Nêzî 3000 zarok sêwî man.
Li Çiyayê Şengalê 600 zarok û kalên ku asê mabûn, ji tîn û birçînan canê xwe ji dest da. Di encama operasyonên Asayîş û Pêşmergeyan de 953 keç, 328 kur 1441 zarok ku ji van 684 jê keçên kemilî bûn, bi tevahî 2640 kurdên êzdî ji desdihête DAIŞê hatin rizgarkirin. 1400 zarokên êzdî niha di desdihête DAIŞê de ne. 280 kesên ku dixwastin biçin Ewropayê di Derya ya Egeyê de xeniqîn. Cenazeyê 460 kesên ku xeniqîne nehatin ditin. 4000 êzdî niha di kampên li Yûnanistanê dimînin. Nêzî 300 Şengalî jî di kampên li Amed û navçeya Midyad a Mêrdînê de dimînin.
Digel koçberîya jin û zarokan jibo Çiyayê Şengalê, gelek êzdiyan xwe spartin binarên Şerfedînê û di wî çiyayê asê de rêya DAIŞê birrîn û nehiştin DAIŞ xwe bigihîne mezargehên Şerfedînê. Herçend dagirkirina Şengalê ji aliyê DAIŞê ve moralê kurdan li her çar parçeyên Kurdistanê xirab bike û nîgeranî bi raya giştî ya kurdan re afrandibe jî, hêzên kurdî xwe bi hawara kurdên Şengalê re gihandin. Di encama diplomasîya Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî, Hevpeymaniya Navneteweyî piştevaniya xwe ji Pêşmergeyan re tekez kir û rê liber êrîşê DAIŞê hatin birîn û plan bo azadkirina Şengalê hatin danîn.

Dihête çaverêkirin ku bajarê Şengalê ku di encama dagîrkirina DAIŞê de hatibû wêrankirin wekî mûze bihê hiştin û li kêleka bajarê kevn bajarekê nû bihê avakirin. Herwiha piştî DAIŞ ji Mûsilê hat derxistin Şengal wekî parêzgeha 5an a Herêma Kurdistanê bihê ragihandin û navçeyên kurdnişîn ên deşta Nînowayê jî bikevine ser Şengalê. Ligor zanyarîyên BasNewsê jiberpirsên êzdî yên Şengalê wergirtine berevanîya Şengalê û herêmê dê 8 hezar û 500 Pêşmergeyên êzdî bikin.

Di 12ê Çiriya Pêşîn a 2015an de bi beşdarîya 20 hezar Pêşmergeyan û Serfermandarîya Hêzên Çekdên ên Herêma Kurdistanê û piştevaniya hêzên navneteweyî Şengal û gundên êzdîyan ji DAIŞê hatin standin. Digel rizgarkirina bajêr di encama operasyonên taybet ên Asayîşa Kurdistanê de du hezar û pêncsed kurdên êzdî ji desdihête rêxistinê hatin rizgar kirin.

PKKê rêxistinên xwe jî anîne Şengalê

Herçende zêdetir ji salêkê ye DAIŞ li Şengalê hatiye şkestin, hewlên Herêma Kurdistanê jibo dermankirina birînên xelkê Şengalê jiber nakokîyên di navbera PKK – PDKê, qeyrana Hewlêr – Bexdayê, hebûna DAIŞê ya li Mûsilê bi ser neketine. DAIŞ salekê navenda bajar dagîr kiribû; rêxistinê bi danîna teqemeniyan, kolana tunelan û îmhakirina binesaziya bajar zirareka mezin daye bajêr. Herwiha di encama bombebarana balafirên hêzên hevpeyaman, ku bi mebesta piştevaniya Pêşmergeyan dijî baregehên DAIŞê hatin encam dan li bajêr kevir liser kevir nemaye û bi hezaran xelkê êzdî wekî ku me li destpêkê jî amaje pê kir yan li kapman yan jî li konan dimînin. Şervanên PKKê yên ji Rojavayê Kurdistanê û ji Qendîlê hatine Şengalê; di nava du salan de rêxistinên xwe yên bi navê (YPG, YPŞ, YPJ, YJA STAR, HPŞ) anîne bajêr û li gelek gund û herêmên Şengalê binkeyên leşkerî danîne. Herwiha civanên êzdî çekdar kirine. Digel çekdarkirina ciwanên êzdî li herêmê, grûpa Encûmena Êzdîyên Şengalê ya bi ser PKKê ve di sersala 2015an de bi navê "Rêveberîya Xweser Îradeya me ye" konferans li dar xistin û hewl dan modela kantonên Rojavayê Kurdistanê derbasî Şengalê bike. Li aliyê din niyet heye meşrûiyedihête bide korîdora ku di navbera Şengal û Rojavayê Kurdistanê de çê kirine.

Hevkarîya PKKê û Mîhwera Şie li Şengalê

Pisporên siyasî amajeyî wê çendê jî dikin ku PKK ji bilî ajandaya xwe ya siyasî bûye şîrîkê plan û stratejiyên Mîhwera Şie û herwiha tifaqek di navbera PKK, Tehran, Şam û Bexdayê de çê bûye. Hêzên PKKê yên li Şengalê (YPG, YPŞ, YPJ, YJA STAR, HPŞ) hevkarîyê bi Yekîneyên Berevanîya Şengalê (YBŞ) re dikin. YBŞ ji 400 – 500 şervanên êzdî pêk dihête û serkêşîya wê Heyder Şeşo dike. YBŞ bûye beşekê milîşên şîe, Heşda Şeibî û piştevaniya leşkerî û darayî ji Bexdayê distîne. Çawan ku dihête zanîn Heşda Şeibî ji aliyê Fermandarê Hêzên Qûds, Qasim Silêmanî ve hatiye ava kirin.
Hin şîrovekar û vekolerên siyasî balê dikşînin ser desttêwerdanên Îranê yên li Rojhilata Navîn û plana wê ya damezrandina Hîlala Şîe û ameje bi wê yekê dikin ku tevgerên PKKê yên li Şengalê û hevalbendîya Beşar Esed û PYDê jî encamên stratejîya Tehranê ne. Herwiha Tehran bi riya PKKê hewl dide Şengal û Rojavayê Kurdistanê ku aniha di desdihête PYDê de ye bike deriyek jibo korîdora Sûriye, Îsraîl û Lûbnanê.

Herêma Kurdistanê - DYAyê jibo dawîyê li awarebûn û penaberîya kurdên êzdî bihînin û Şengalê ji nû ve ava bikin hatine ser xet. Rayedarên Amerîka û nûnerên siyasî yên Herêma Kurdistanê, nûnerên êzdîyan di parlementoyê de bang li PKKê dikin ku ji Şengalê derkeve. Siyasetmedarên Herêma Kurdistan û berpirsên Amerîkayê hebûna PKKê ya li Şengalê û helmetên wê yên xurtkirina desthilatdarîyê wekî sedema avadannebûna Şengalê didin diyar kirin.

Karayılan: Em ê hêzên xwe ji Şingalê derxînin

Piştî nerazîbûnan endamê rêveberiya PKKê PKKê Murat Karayilan ji televîzyoneke nêzikî PKKê re axivî û diyar kir, ku ew yekîtiya kurdan weke armanceke stratejîk dibînin û lewma divê kurd pirsgirêkên xwe bi diyalog û rêbazên hemdem çareser bikin. Karayılan eşkere kir, ku li ser hebûna hêzên PKKê yên li Şengalê, di navbera wan û Herêma Kurdistanê de hevditin hene û got; "Ez yekemîn car e vê yekê li vir eşkere dikim. Ji xwe me eşkere ji wan re gotiye, ku piştî bidawîbûna gotûbêjan, emê hêzên xwe ji Şengalê vekişînin." Karayılan destnîşanî bi gotinên Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî yên derbarê hebûna hêzên PKKê li Şengalê de jî nerazîbûn nîşan da û got, "Ji ber çi sedeman birêz Nêçîrvan Barzanî ev gotin kirine, ez nizanim." Karayilan got, ku ew di wê baweriyê de ye dê Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî di vê mijarê de destpêşxeriyê bike.

Hewlêr – Washington hatine ser xet

Di dawîya sala 2016an de hebûna PKKê ya li Şengalê dîsa bûye cihê nîqaşan. Berîya bi du hefteyan Rawêjkarê Wezareta Derve yê Dewletên Yekgirtî yê Amerîkayê (DYA) John Kirby di konfeansa çapemeniyê de bal kişand ser hebûna PKKê ya li Şengalê û diyar kir ku divêtPKK ji Şengalê derkeve. Ji bilî daxuyaniya rawêjkar Kirby, medyaya Herêma Kurdistanê behsa wê çendê jî kir ku rayedarên amerîkî li Şengalê danûstandinan bi PKKê re dikin da ku PKK ji Şengalê derkeve. Di şeva 28ê Kanûna 2016an de Mark Toner ê Rawêjkarê Wezareta Derve yê Amerîkayê di konferanseka çapemeniyê de da xuya kirin ku ew hebûna PKKê li Şengalê qebûl nakin û wiha got: "Em hebûna PKKê li Şingalê wek astenga sereke dibînin"
Serokwezîrê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Neçîrvan Barzanî jî berîya bi çend rojan di hevpeyvîna digel rojnamegera Al Monitorê de bal kişandibû ser hebûna PKKê ya li Şengalê. Barzanî, liser derneketina PKKê ya li Şengalê wiha got; "Eger bi xweşî dernekevin em ê wan bi zorê derxin!" Mîrê êzdîyan Mîr Tehsîn Beg, Qeymeqamê Şengalê Miheme Xelîl û nûnerên partîyên din ê Kurdistanê jî bang li PKKê dikin ku ji Şengalê derkeve û rê liber wê yekê veke ku Hikûmeta Herêma Kurdistanê jibo çarenivîsa xelkê êzdî projeyan bi cih bîne.
Stratejîya Hewlêr û Washingtonê
Wekî ku dihête zanîn di 12ê Tîrmeha 2016an de rêkeftineke siyasî û serbazî di navbera Hewlêr – Washingtonê de hatibû yajo kirin. Yek ji xalên wê rêkeftinê ev bû; DYA wê li Kerkûk, Duhok, Şengal, Helebçe û Şengalê baregehên leşkerî dayne û rahênerîya Pêşmergeyan bike. Piştî wê rêkeftinê Bexda – Tehranê nerazîbûna xwe anîbûn ziman û herwiha Wezîrê Berevanîya Iraqê Xalid Ubeydî di konferanseka çapemeniyê de aşkere kiribû ku ew wê rêkeftinê qebûl nakin û divêtWashington bi wan re danûstaninê bike ne bi Hewlêrê re. Digel nerazîbûna Bexdayê, medyaya Iraqê eşkere kir ku Fermandarê Hêzên Quds Qasim Silêmanî kopiyeka belgeya rêkeftinê ji Heyder Ebadî xwestiye û daxwaz ji Ebadî kiriye ku dijayetîya rêkeftinê bike.

Kurd bo serxwebûnê kom bûn

SIWAR BEDIRXAN

DAIŞ di encama serkeftinên mezin ê Pêşmergeyan tûşî şkestinên mezin bû. Pêşmergeyên Kurdistanê karîn rê li ber DAIŞê bigirin û di nava çend mehan de hêza wê bişkînin. Pêşmergeyên Herêma Kurdistanê herî dawî di 17ê Çiriya Paşîn de di Operasyona Mûsilê beşdarî de kirin û hemû riyên DAIŞê yên çûn û hatinê birrîn. Niha li Mûsilê di navbera Artêş Iraqê û DAIŞê de pevçûn berdewam dikin; dihête çaverê kirin ku heta çend mehên din DAIŞ bi temamî ji Mûsilê bê derxistin.
Proseya piştî DAIŞê hem li Iraqê û hem li Mûsilê jî di proseveka germ e. Liser îdareya Mûsilê, herêmên xala 140 a destûra Iraqê, hewlên Heşda Şebî yên li herêmên şîenişîn gelekî nîqaş hene. Li aliyê din, tê çaverê kirin ku di 2017an de proseya serxwebûna Herêma Kurdistanê bigihe encamê û milletê kurd dê biryarê liser çarenivîsa xwe bide. Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî, Serokwezîrê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Neçîrvan Barzanî gelek caran anîn ziman ku azmûna "Iraqê Federal" feşiliy û ya baş ew e ku ew û Bexda bibin cîranên hevdu. Demeka dirêj e cîrantîya Bexda – Hewlêrê, mafê kurdan ê rapirsîya serxwebûnê, derfet û arîşeyên kurdan ê serxwebûnê tên nîqaş kirin. Herî dawî bi sponserîya K24ê di 15 û 16ê Kanûnê de, li Zankoya Amerîkî ya Kurdistanê li Duhokê bi navê "Serxwebûna Kurdistanê - Çaliş û Derfet" konferansek hat li dar xistin. Babetên serekî yên konferansê derbarê yasayên navneteweyî yên li ser çarenivîsa milletan û mafê çarenivîsî yê gelê kurd, rehendên aştî û asayişa Herêma Kurdistanê, proseya piştî serxwebûnê, stratejîya hevbeş di navbera welatên rojava û Herêma Kurdistanê de, pêşeroja Rojhilata Navîn û pirsgirêkên navxweyî yên kurdan bûn.

Nûnerên partîyên siyasî li Duhokê kom bûn

Di konferansê de derfet û astengên li hember serxwebûna Herêma Kurdistanê du rojan ji aliyê siyasetmedar, akademîsyen, dîplomat û pisporên siyasî ve hat gotûbêj kirin. Li ser vexwandina K24ê me jî romala konferansê kir. Dîmenê hola civînê ji konferansê wêdetir wekî civîna Kongreya Netewî bû. Lewre, ji her çar parçeyên Kurdistanê siyasetmdar, rewşenbîr û nûnerên partîyên siyasî di konferansê de amade bûn. Sekreterê PDKÎyê Mistefa Hicrî, Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Neçîrvan Barzanî, Serokê Dîwana Serokatiyê Fûad Hûsên, Cihgirê Sekreterê PAKê Hûsên Yezdanpena, Serokê ENKSê Îbrahîm Biro, Cihgirê Sekreterê PDKSê Kawa Ezîzî, Serokê PSDKê Hemê Hecî Mehmûd, Cihgirê Sekreterê YNKê Dr. Behrem Salih, Berpirsê Polîtbûroya YNKê Mele Bextiyar, Serokê DBP Kamuran Yüksek, Sekreterê Yekgirtûya Îslamî Selehadîn Behaedîn, Rawêjkarê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Sefîz Dizeyî, nûnerên Komeleya Îslamî, parlementerên êzdî Şêx Şamo, Viyan Dexîl, Fermandarê Hêza Êzdîxanê Qasim Şeşo, Fermandarê YBŞê Heyder Şeşo di konferansê de amade bûn. Siyasetmedar û akademîsyenan serxwebûn gotûbêj kir
Konferansê bi axaftina destpêkê ya Şewirmendê Encumena Asayîşa Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî dest pê kir. Mijara panela yekem, qanûna navneteweyî û mafê çarenivîsî yê gelê kurd bû. Akademîsyenê Zankoya Amerîkî ya Kurdistanê Dr. Michael Mulnix, balyozê berê yê Amerîka li Iraqê Zalmay Khalilzad, wezîrê berê yê dervê yê Fransayê Dr. Bernard Kouchner, Cihgirê Sekreterê YNKê Dr. Berhem Salih, wezîrê berê yê derve yê Iraqê Hoşyar Zêbarî, Dr. Îsmail Beşikçi, akademîsyenê amerîkan pisporê siyaseta kurdî li Tirkiye û Iraqê Profesor Michael Gunter di panelê de behsa qanûnên navneteweyî û mafê çarenivîsîya gelê kurd kirin.
Panela duyem a konferansê liser stratêjîya hevbeş di navbera Amerîka, NY û YE û Hikûmeta Herêma Kurdistanê de bi beşdarîya Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî, Dr. Adil Ebdilmehdî, Osama Nuceyfî pêk hat.
Panela sêyemîn li ser rehendên aştî û asayişa Herêmê Kurdistanê piştî serxwebûnê, bi beşdarîya Dr. Peter Goulbert, Prof. Ofra Bengio, Cengiz Çandar û rojnamevan Amberin Zaman bi rê ve çû.

Neçîrvan Barzanî: Pêwîst e PKK Şengalê vala bike

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan di roja ewil a konferansê de gotarek pêşkêş kir. Axaftinên Serokwezîr Barzanî yên derbarê hebûna PKKê li Şengalê de bûn rojeva hemû kurdan. Barzanî got: "Îro hebûna PKKê li Şengalê bêstiqrarîyek li deverê çê dike, yek ji wan sedemên ku Şengal avedan nabe, hebûna PKKê li wê deverê ye û ev jî rastîyek e; jiber ku xelk ji dahatîya xwe piştrast nînin, jiber wê jî venagrin deverê. Divê PKK wê yekê fêm bike û di ber xêra xelkê deverê de ji wê deverê derkeve." Herwiha Barzanî amaje bi cografiyaya Şengalê kir û ragihand, cografiyaya Şengalê arîşeyeke mezin bû li pêşîya Herêma Kurdistanê, jiber, ku bi gotina wî, di dema êrîşa DAIŞê bo ser Şengalê de, ew dever gelek ji Herêma Kurdistanê dûr bû û wekî giraveka cuda ji axa Herêma Kurdistanê dûr bû. Barzanî ev yek wekî arîşeyeke mezin bo Herêma Kurdistanê bi nav kir.

Divê serxwebûn bê ragihandin

Gotarên wezîrê derve yê berê yê Fransayê Dr. Bernard Kouchner û balyozê berê berê yê Amerîkayê li Iraqê Zalmay Khalilzad jibo guhdaran serincrakêş bûn. Bi taybetî yên Dr. Bernard Kouchner, ku eşkere kir pêwîst e serxwebûna Kurdistanê bê ragihandin û dem hatiye ku sînorên vê herêmê bêne guhartin. Dr. Bernard Kouchner behsa bîranîneke xwe ya di 1975an digel Mele Mistefa Barzanî kir û tekez kir ku wî şahîdî di doza kurdan a serxwebûn û azadiyê de kiriye û ew piştevaniya kurdan dike. Kouchner wiha axivî: "Piştevaniya serxwebûna Kurdistanê dikim û 50 sal in çaverêyî vê rojê dikim, ku kurd xebat bo demokrasî û azadî dike; baştirîn rê jibo serxwebûnê, riya Neteweyên Yekgirtî ye. Qanûnên navneteweyî heger piştgiriyê li tevgereka wek kurd neke, pêwîst e ew qanûn bihêne guhartin, hîç nebe divêt pirs ji gel bihête kirin, bizanin ka çarenivîsa xwe çawa dixwazin."

Serxwebûna Kurdistanê dê tesîrê li cihanê bike

Balyozê Berê berê yê Amerîkayê li Iraqê Zalmay Khalilzad jî behsa dîroka kurdan û şerê wan ê lidij rejîma Bees kir û ragihand di dirêjahîya dirokê de, heta niha hemû kurd xwastine bibin dewlet, û niha ew derfeta jibo wan rexaye. Khalilzad di gotara xwe pêla serhildanên Bihara Erebî û şerê navxweyî yê li Sûriyê jî wekî weki "guhertinên nû" yên li herêmê destnîşan kir. Dîplomatê amerîkî bang li aliyên siyasî yên kurd jî kir û ragihand ku divê serxwebûn armanca sereke ya kurdan be û wiha got: "Li herêmê guhertinên mezin û pêşhatên nû çêdibin. Divê welatên mezin jî xwe ligel vê rewşê biguncînin û destpêşxeriyên wan yên nû hebin. Hemû kurd dixwazin bibin xwedan dewlet û gumana ti kesî jî vê yekê nîne. Bi nêrîna min biryara serxwebûna Kurdistanê biryareka giring, giran û çarenivîssaz e. Ev yek dê tesîrê li hemû cihanê bike. Divê serxwebûn bibe armanca sereke. Herwiha divê di nav kurdan de rêkeftinek hebe."

Mesrûr Barzanî: Me bêdewletî tecrûbe kiriye

Di roja duyem a konferansê de piştî panel bi dawî bûn Şêwirmendê Encûmena Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî axaftinek pêşkêş kir. Barzanî li ser panelên du rojan axivî û wiha got: "Di konfransê de gelek tişt derbarê serxwebûna Kurdistanê de hatin pêşkêşkirin û ji wan jî ew bû ku aya ew yek rîsk e yan na û aya stiqrarê vedigrîne herêmê yan zêdetir îstiqrarê têk dide. Ew dema ku em dihatin kîmyabaran kirin û dihatin enfalkirin, jixwe me daxwaza serxwebûnê nekiribû û ew hemû derbiderî û malwêraniya ku hate serê gelê me di encama daxwazkirina serxwebûnê de nebû, lê çima wê demê bi wê awayê dirindane dijatiya gelê me hat kirin?" Di beşeke din a axaftina xwe de Mesrûr Barzanî behsa ezmûna dewleta kurdî li herêma Rojhilata Navîn kir û diyar kir: "Me azmûna dewleta kurdî li deverê nebûye, heta ku em bêjin sedema nebûna stiqrarê bûye, lê belê me nebûna dewleta kurdî dîtiye, ku bi xwe re heta çi qasî nexweşî û karesat ji gelê me re aniye û sedemek jî bûye bo nebûna stiqrarê li Rojhilata Navîn." Derbarê rîsk û xetera serxwebûna Kurdistanê de, Barzanî got: "Tî tiştek di jiyanê de nîne, ku %100 bê rîsk be, lêbelê bi piştrastî rîska neserxwebûna me gelek ji wê yekê zêdetire ku em serxbixwe bin û ber bi serxwebûnê ve neçin, jiber me ew yek azmûn kiriye."
Dîplomatê Fransayê Dr. Bernard Kouchner di gotara xwe de li rûyê Şewirmendê Encumena Asayîşa Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî û Serokwezîrê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Neçîrvan Barzanî nêrî û behsa bîranîneka xwe digel Mele Mistefa Barzanî kir û diyar kir ku wî bi çavên serê xwe şahidî li kurdan li tevgera Barzanîyan kiriye ka çawa doza serweriyê ji bo miletê xwe dikin. Ew yekem car digel pizişkên bêsînor hatibû herêmê û wê demê berxwedêriya kurdan dîtibû. Wî careka din şahidî li kurdan dikir; li nevîyên General Mistefa Barzanî dikir ku ligel hev in ew xema serwerî û mafê rewa yê gelê xwe dixwin. Di kulîsên siyasî yên Herêma Kurdistanê de ne behsa rikberiya nevîyên General Mele Mistefa Barzanî, behsa planên wan ên jibo siberoja Kurdistanê dihête kirin. Herwiha vexwandina siyasetmedarên jî herçar parçeyên Kurdistanê jibo konferans û civînên wisa, nîşana bihêzbûna dîplomasîya wan e.

Dr. Michael Gunter:

Hewce ye kurd serxwebûnê realîze bikin

EDÎTORÎYA HEFTENAMEYA BAS

Michael Gunter di etudên liser kurdan li Tirkiye û Iraqê otorîteyeka akademîk e. Heta niha wî liser kurdan heft pirtûk nivîsîne û li gelek unîversîteyên cîhanê, nemaze li DYA, Tirkiye, Çîn û Austryayê di warê zanistên siyasî de wane dane. Vêgavê li Tennessee Technological University di warê zanistê siyasî de mamoste ye. Hevpeyvîna jêrê di dema Konferansa Serxwebûna Kurdistanê li Duhokê, di çirîya pêşîn ya 2016 de hat li dar xistin, digel wî hate encamdan.

Birêz Gunter, Dr. Beşikçi Kurdistanê wekî kolonîyeka navneteweyî pênase dike. Lê te Kurdistan wekî kolonîyeka nepenî yan veşartî pênase kir û rewşa wê şibane welatên Sovyeta berê, ku piştî herifîna Sovyetê serbixwe bûn. Heger em analojîyekê di navbera Iraq û Sovyetê re bikin, gelo hûn çi dahatîyekê jibo kurdan li Iraqê dikarin pêşbînî bikin?

Iraq dewleteka binketî yan heriftî ye. Iraq bi giştî tenê di hişê Wezareta Derve ya DYAê de mewcûd e, lê bi bawerîya min, mubalexe têde hebe jî, di realîteyê de ev dewleta tune. Iraq ji berê de dewleteka heriftî bû. Bînin bîra xwe Joe Biden, ku niha cêgirê serokomarê DYAyê ye, berî deh salan çi gotibû. Deh salan berî niha wî pêşniyaz kiribû ku dewleta niha ya Iraqê bi ser sê dewletan de bihête parçe kirin. Lê problema parçekirina sê dewletan jî heye, jiber ku gelên ku li vê coxrafyayê dijîn hatine têkel in. Lê wekî hûn dizanin herder wisa ye, ya giring ew e, ku mirov li xestîya etnîk a her navçeyê binêre. Rast e, gelek kes dê mecbûr cih û warê xwe biterikînin. Dîsan xêzên coxrafîk ligor xestîya etnîk dihêne kêşan. Jibo nimûne, gava ku Hindûstana kolonyal hate dabeş kirin, gelê wê jî têkel bû. Bêguman gelek kuştin û nexweşî jî gava ku Hindûstan û Pakistan di sala 1947ê de ji hev veqetiyan çê bû. Lê gava ku biryar bidin, rêyeka din tune. Ya giring vê gavê Iraq wekî dewlet heriftî ye, Sûriye ji wê jî heriftîtir e; hema jiber wan herdu sedaman be jî, kurd divêt jibo xwe li çareyekê bigerin. Yanê heriftîbûna vê dewletê egerê herî sereke ye, ku kurd li rêyeka din bigerin. Jibo kurd dema wê hatiye ku serxwebûna xwe realîze bikin.

Pirsgirêkek din hebûna dewletên cîran yên xwedî kêmîneyên kurd li derûdora Kurdistana Iraqê ye. Gelo helwêsta wan bi bawerîya te dê çawan be. Bo nimûne Turkiyê dê çawan serederîyê bi hewlên kurdên Iraqê bo serxwebûnê re bikin?

Erê rast e. Ew pirsa jî heye û ev pirs ya îrredentîsmê ye, ango pêvegirêdana axa welatekê din digel axa xwe. Lê Hikûmeta Herêma Kurdistanê (HHK) bi vê pirsgirêkê hesiyaye û hest bi hesasiyetên Tirkiyê kiriye, loma karîye Tirkiyê qane bike, ku ti dozên wê yên erdî liser navçeyên kurdnişîn ên Tirkiyê nîne. Tirkiyê ev yek qebûl kiriye, lê rast e, piranîya kurdan derveyî sînorên Herêma Kurdistanê dijîn û lewre dê problem her çê bibin, loma pêdivî ye HHK garantîyên pejirbar bide Tirkiye û bi taybet Îranê. Sûriye jixwe tune, lê divêt HHK biselmîne ku ti dewa û dozên îrredentîst yên wê liser herêmên kurdî li Îranê û Tirkiyê tune.

Mebesta te ji wan garantîyan çi ye? Tu dikarî naveroka wan garantîyên pejirbar hindekê şirove bikî?

Pirseka baş û li cih e. Jibo Tirkiyê diyar e, çi ne. Tirkiye bi awayekî bûye parêzvana Herêma Kurdistanê. Lê heta ku Tirkiye hest neke ku ti dozên îrredentîst yên HHK liser herêmên kurdî yên Tirkiyê tuneye, Tirkiyê dê parêzvanîya wê neke û tenanet ticaret û bazirganîyê jî pêre neke. Hema ku ev rastîya ku HHK piştgîrîya PKK yan PYDê nake û tenanet lidij wan rawestiyaye, jibo Tirkiyê garantîya herî mezin e. Baş e, gelo HHK çawan dikare palpiştîya mafên demokratîk yên kurdan li Tirkiyê bike û di heman demê de jibo Tirkiyê hevalbendeka stratejîk be?

Tirkiye welatekê mezin e, lê mixabin ligor mezinahîya xwe reftarê nake. Demokrasîyeka mînende û karîger e; armanca damezrandina Tirkiyê jî ev bû; ku bibe welatekê demokratîk yê ligor rêbaza Rojavayê. Di heman demê de nerîtên xwe yên îslamî jî qebûl bike û paşê ew kapasîte hebe bibe endama YE. Lê wekî hûn dizanin, vêgavê rewşa siyasî ya Tirkiyê jibo wê armancê ne libar e. Heger Tirkiye bikare bizivire ser xeta rastîn û bibe demokrasiyeka fonksiyonel ya rasteqîn, hînga pirsa kurd jî dê di qalibê demokrasîyeka wisa de heta radeyeka bilind çareser bibe. Rêbaza çareserkirina pirsa kurd li Tirkiyê jî her ev e, Tirkiye bi demokrasîyeka karîger dikare vê pirsê çareser bike, ku têde kurdên etnîk xwe wekî hemwelatîyên derece yek hempayê hemwelatîyên tirk bibînin. Lê ne Kurdistaneka serbixwe, jibo wê niha şansek tune.

Lê gelo Tirkiyê dê liser doza kurdan jibo serwerîyê, meqseda min nemerkezîkirin û parvekirina serwerîyê di qalibê otonomîya herêmî yan federasyona terîtuar de çi bertekekî nîşan bide?

Pirseka li cih. Ev jî problemeka din e. Tirkiye welatekê ekstrem merkezî ye û piranîya welatên modern wekî DYA, Brîtanya, Spanya û Fransa jî zêde merkezî bûn. Fransa bixwe bêreje merkezî bûn. Lê ev welat hemî di van çend dehsalên dawîyê de bi awayekê serkeftî xwe desantralîze kirin, xwe nemerkezî kirin. Tirkiye ji vê jimerkezkirinê ditirse, jiber ku wisa hest dike ku bo mînak kurd dê ber bi serxwebûnê ve bişemitin. Ez tirsa Tirkiyê fêm dikim, lê jibo ku Tirkiye liser piyan bimîne û bibe demokrasîyeka rastîn, divêt ne tenê bihête demokratîze kirin, herwiha divêt desthilat û serwerîyê desantralîze bike, nemerkezî bike û rast e ev dê jibo Tirkiyê pir zehmet be ji ber ku di nerîta siyasî ya wê de tiştekê wisa nebûye. Komara Tirkiyê

“Ya giring vê gavê Iraq wekî dewlet heriftî ye, Sûriye ji wê jî heriftîtir e; hema jiber wan herdu sedaman be jî, kurd divêt jibo xwe li çareyekê bigerin. Yanê heriftîbûna vê dewletê egerê herî sereke ye, ku kurd li rêyeka din bigerin. Jibo kurd dema wê hatiye ku serxwebûna xwe realîze bikin.”

liser bingehê merkezîkirinê hatiye ava kirin, lê împaratorîya Osmanî pir nemerkezî bû. Reformên ku di serdema osmanîyan de dest pê kir bêhtir hewlên merkezîkirinê bûn. Divêt ev bihête guhertin. Heger Tirkiye li ber e, ku zindî bimîne divêt bihête nemerkezî kirin.

Doza modernîteyê, ango modernîteya rojavayî, ku li Tirkiyê bûye model bi piranî liser binemayên têgeheka jakoben ava bûye, ku ew jî tekrengkirina civak û welatî ye. Gelo ev zihniyet yan boçûna jakoben ya monîzma kulturî û etnîk ku li Tirkiyê di qalibê dewleta unîter de hatiye pênase kirin dê çi astengan li hember demokratîzekirin nemerkezîkirineka rastî çê bikin?

Ti rê bilî demokratîzebûnê nîne û demokratîkbûn pêşmercê federalîzmê ye. Tu dikarî nimûneyekê bidî min ku pêkhata federalîzmê têde dixebite heger ew welata demokratîk nebe? Jibo ku tu bikarî xwe bigihînî federalîzmê divêt te ewilî demokrasî hebe, divêt tu desthilat û serwerîyê parve bikî, rêzê bo mafên yên din re bigirî.

Ango vatişa Partîya Demokrasîya Gelan (HDP) ku liser bingehê demokratîzekirina Tirkiyê dabû dest pê kirin rast bû? Lê gelo vê helwêstê karî pirsa kurdan çareser bike yan wan nêzîkî çareserîyekê bike?

Na, ev jî bi mercên li Tirkiyê re girêdayî ye, Tirkiyê niha tûşeka dûr ji demokrasîyê hilbijartiye, divêt cardin lê vegere.

Kîjan rast e? Rojava, Rojavayê Kurdistanê yan jî Kurdistana Sûrîyê?

FARÛQ HECÎ MÎSTEFA

Li Sûrîyê dema kesekî peyva “Kurdistan” anîba ser zimanê xwe, rastî metirsîyeka mezin dihat, nexasim li navçeyên ku piranîya xelkê wan kurd in. Kesê ku ew peyv li ber guhê wî diket, gelek pirs û guman di bala wî de çê dibûn. Partîyên kurdan li wî perçê Kurdistanê newêribûn wê peyvê bi navê partîyên xwe ve bikin. Wekî mînak partîyek ji wan jiber vê yekê perçe bû, ku hinek endamên wê razî bûn û yên din jî nerazî bûn ku peyva Kurdistan li navê partîya wan zêde bibe. Hinek berpirsên wan partîyan di kongreyê partîya xwe de daxwaza “Kurdistan” dikirin, lê piştî ku ji kongreyê derdiketin ji alîyê rêjîmê ve rastî zindankirina bi salan dihatin. Bêguman ew jî piştî ku agahî ji îstixbarata Sûrîyê re diçûn. Rêjîma Sûrîyê jî ew wekî pêngav ber bi Kurdistanîbûnê ve yek didît. Jiber vê metirsîya liser partîyên kurdî û endamên wan, hemû partîyan xwe ji peyva Kurdistanê dûr xistin û peyva “Sûriye” li navên partîyên xwe zêde kirin.

Her peyamek yan daxuyanîyek ji partîyên kurdî derdiket, bi hêsanî navê Kurdistana Iraq, Îran yan Tirkîyê dihat dîtin, lê eger mijar kurdên wî perçeyê Kurdistanê ba, digotin, “rewşa kurdan li Sûrîyê”. Vê yekê jî dijheviyek di navbera wan partîyan û xelkê wan de çê dikir, jiber ku bi eşkere gelek partîyan xwe ji navê “Kurdistana Sûrîyê” bêrî dikirin. Ew jî tevî ku dihête gotin ku navê yekemîn partîya kurdî li Sûrîyê bi navê “Partîya Demokrat a Kurdistana – Sûriye” bû.

Herwiha partîyên kurdî li Sûrîyê derbarê vê yekê de, xwe jîr dikirin û bi eşkere di bingehên xwe yên hizbî de digotin, Kurdistan cara yekem piştî şerê Çaldiranê yê sala 1415an bû 2 perçe û sala 1917an jî piştî peymana Sykes-Picot bi ser 4 perçeyan ve hat perçe kirin.

Yek rastîyê bêje, peyva “Kurdistana Sûrîyê” ew partî rastî nakokîyên mezin dikirin û ew nakokî di hemû kombûn û çalakî yan jî kongreyên navxwe yên wan de dibû pirsgirêk. Rêjîma Sûrîyê jî ji alîyê xwe ve, di zindanîkirina her çalakvanekê partîyên kurdî de dudil nedima, ew jî bi tuhmeteka amadekirî ku ber kurdan vedikir û digot, “Hûn dixwazin perçeyekê ji Sûrîyê jê bikin û bi dewleteka bîyanî ve bikin”. Ez dibêjim, heta ji rêjîmê re ne xûya bû ka ew dewleta bîyanî çi ye?

Rast e ew nakokî yan dijhevîya liser navê Kurdistanê bi her çalakîyeka wan partîyan ve girêdayî bû, lê di destpêka salên 90an de, hertişt hat guhertin û êdî partîyên kurdî nema karîbûn xwe ji zelalkirina rewşa navçeyên kurdî li Sûrîyê û Kurdistanîbûna wan navçeyan dûr bixin. Li vir gotinên wan wekîhev dernedketin, lewma hinek ji berpirsên partîyan êdî ji wî perçeyê Kurdistanê re digotin, “perçeyê Kurdistanî yê ser bi Sûrîyê ve”. Hinekan jî hincet dikirin ku hemû navçeyên kurdî li Sûrîyê ne bi hev ve ne, lewma ew nikarin wekî perçeyên din ên Kurdistanê bêjin “Kurdistana Sûrîyê”, lê xwedîyê vê hinceta dawî bi xwe jî dizanîbû ku hinceta wan sist û lawaz e.

Dema Raperîna Qamişlo di sala 2014ê de çêbû, hemû alîgirên partîyan rabûn û bi eşkere gotin “Kurdistana Sûrîyê”. Êdî ev gotin di nava xelkê û rewşenbîran de cih girt. Ew gotin ma heta ku şoreşa Sûrîyê sala 2011ê dest pê kir. Hinek partîyan êdî di peyamên xwe yên sîyasî û hizbî de peyva “Rojava” bikar anîn, ew jî wekî“Başûrê Kurdistanê, Rojhilatê Kurdistanê û Bakurê Kurdistanê”. Lê alîyê ku ev peyv ji partîyên din zêdetir bi kar anî, Partîya Yekîtîya Demokratîk -PYD- bû, lê xwe ji gotina “Rojavayê Kurdistanê” dûr dixin, nexasim piştî ku peyva “gelên demokratîk” xistin nava peyama xwe de. Herwiha dihête zanîn ku PYD berîya şoreşa Sûrîyê jibo hizra “Mezobotamya” hewl dida û dixwest vî navî li wê navçeyê bike.

Bi rastî herdu gotinên “Rojavayê Kurdistanê” û “Kurdistana Sûrîyê” di nava xelkê de li wî perçeyê Kurdistanê dihêne qebûl kirin. Eger em bêjin navenda Kurdistanê Hewlêr e, wê demê perçeyên din ên Kurdistanê ligor hêlên sirûştî yan erdenîgarî dihêne bi nav kirin, bi vê yekê jî em dikarin bêjin “Rojavayê Kurdistanê”. Lê eger em rastîya heyî û realîtê bikin pîvan, ew perçeyê ku ji Kurdistanê li gorî peymana Sykes-Picot bi Sûrîyê ve hatiye ve kirin, em dikarin navê wê bikin “Kurdistana Sûrîyê”, ew jî wekî ku partîyên kurdî di peyamê xwe de digotin Kurdistana Iraqê yan Kurdistana Îranê.

Ma ku em bêjin, hinek lêkoler û şirovekarên sîyasî yên ereb dema ku behsa rewşa Sûrîyê dikin û bi taybetî dema liser rewşa kurdî disekinin, gotina “Kurdistana Sûrîyê” bikar dihînin, ew jî dihête wê watayê ku di bala her çavdêr û şopînerekê navçeyê de gotina “Kurdistana Sûrîyê” heye. Bila em zêdetir nêzîkî rastîyê bin, “Kurdistana Sûrîyê” hemûyan ji tirsa û dîktatorîya berê rizgar dike, lewma jî tenê gotina wê redkirina rojên berê ye û guncawbûne ligel hizra şoreşê, ma em niha ne di şoreşê de ne?!

PYD ji “Rojava” jî aciz e

Li navçeya Rimelana Rojavayê Kurdistanê di 27ê Kanûna 2016an de duyemîn civîna Sîstema Federalîya Demokratîk a Rojava- Bakurê Surîyê ya dest pê kir.

DERYA KILIÇ

Demeka dirêj bû jibo ragihandina federalîzmê li Rojavayê Kurdistanê amedekarî dihatin kirin. Ji despêka demsala biharê ve ew xebat didomin. Bi mebesta danîna sîstema federalîyê Meclîsa Damezrêner a Sîstema Federalîya Demokrat a Rojava-Bakurê Sûriyê hatibû damezrandin û derbarê federalîzmê de hin biryar hatibûn girtin. Piştî wê civînê xebatên federalîzmê berdewam kiribûn. Herî dawî nûnerên PYDê û berpirsên kontonên Xweserîya Demokratîk di 17ê Kanûn 2016an de li bajarê Hesekê li hev kom bûn.

Li navçeya Rimelana Rojavayê Kurdistanê di 27ê Kanûna 2016an de duyemîn civîna Sîstema Federalîya Demokratîk a Rojava- Bakurê Surîyê ya dest pê kir. Li gor zanyarîyan 163 endamên desteya rêxistinî ya Encumena Damezrêner a Sîstema Federalîya Demokrat a Rojava-Bakurê Sûrîyê, Hevserokên Meclîsa Damezrêner a Sîstema Federalîya Demokrat a Rojava-Bakurê Sûrîyê Mensûr El-Selûm û Hediye Yûsif beşdarî civînên bûn.

Civîna Meclîsa Damezrîner a Sîstema Federalîya Demokratîk a Rojava-Bakurê Sûrîyê di roja duyemîn de bi nirxandin li ser bendên hevpeymanîya civakî berdewam kir. Di roja duyem de biryarek derbarê navê îdareya xwecihî ya Rojavayê Kurdistanê de hat standin. Meclîsa Damezrêner a Sîstema Federalîya Demokrat a Rojava-Bakurê Sûrîyê ragihand ku wan navê îdareyê kiriye Sîstema Federalîya Demokratîk a Bakurê Sûrîyê û navê “Rojava” jê derxistiye. Biryara Meclîsa Damezrêner a Sîstema Federalîya Demokrat a Rojava-Bakurê Sûrîyê nerazîbûnek bi xelkê kurd re çê kirîye.

Dihête dîtîn ku kiryarên PYDê yên xwezalkirina li ser îdareyê û hevkarîya wê ya ligel rejîma Beşar Esed nîgeranîyek liba kurdên Rojavayê Kurdistanê çê kiriye. Çalakên siyasî û vekolîner amaje li ser wê çendê dikin ku PYD bûye karmendê rejîma Beşar Esed li Rojavayê Kurdistanê. Çunkû ji destpêka serwerîya PYDê li Rojavayê Kurdistanê girtina siyasetmedaran, koçberîya xelkê kurd zêde bûye. Çavkanîyên Rojavayê Kurdistanê aşkere dikin ku heta niha zêdetir ji 50 siyasetmedar bi dehan rojnameger û aktivîstên mafê mirovan di zindanên PYDê de ne. Xelk xema siberojê dixwin.

Civîn û hevdîtinên li asta navdewletî yên jibo çareserkirina qeyrana Sûrîyê jî berdewam dikin. Dihête pêşbinî kirin ku di meha Çileyê de bi serperiştîya Îran, Tirkiye û Rûsya li Astaneyê civînek bi rêve biçe. Ligor pisporên Rojhilata Navîn polîtîkayên Amerîkayê jî girîng in. Ji alîyê din vê Tirkiye, Îran û Rûsya dixwaze qeyrana Sûrîyê ji asta navneteyî bînin asta herêmî û ev jî dê ti arîşeya heyî çareser neke. Li gorî zanyarîyan jibo ku li Sûrîyê agirbesteka mînende bihête ragihandin dîplomatên Tirkiyê û Rûsyayê 23ê Kanûnê bi muxalîfan re dest bi hevdîtinan kiribûn. Lêbelê PYDê ji bo wan civînan nehatibûn vexwandin. Aniha Tirkiyê û Rûsya li ser agirbestê bi muxalifan re li hev kirin û agirbest di 29 Kanûnê de dest pê kir. Berî van hevdîtinan wezîrên karên derve yên Îran, Rûsya û Tirkiyê li Moskovayê civiyabûn û di vê civîna lûtkeyê de biryara agirbestê dabûn.

Nûnerên Tirkiyê eşkere dikin ku PYD û YPG dê beşdarî civîna Astanayê nebe. Ji alîyê din ve raya giştî vê biryarê rexne dike; herwiha şirove li ser wê çendê jî hene ku bêyî YPGê û PYDê civînên çareserîyê dê ji keşeyan re nebe çareserî. Nûnerên PYDê Tirkiyê rexne dikin û diyar dikin ku civîna Astana û agirbestê dê wekî hevdîtinên Cenevê bê encam bimîne. Ji ber ku bêyî kurdan qeyrana Sûriyê nayê çareser kirin.

YPG ji Helebê vedikişe

Dema ku li Helebê rejîmê êrişên xwe zêde kir, YPG jî ji aliyê Efrînê bi taxa Şêx Meqsûdê li Helebê 7ê tax bi dest xistibûn û tê zanîn ku li taxa Şêx Meqsûdê 50 hezar kurd dijîn. Li gorî zanyarîyan 700 endamên YPGê taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê kontrol dikin.

Li gor zanyarîyên BasNewsê ji herêmê bidestxistine piştî ku rejîmê Heleb kontrol kir, daxwaz ji YPGê kirîye ku ji Helebê derkeve here hêzên xwe bibe Efrînê. Derbarê vê îdiayê hin şirove hene. Endamê TEV-DEMê Aldar Xelîl û Hevseroka Meclisa Efrinê Hevî Mustefa federalîzm û rûdanên dawiyê ji BasNewsê re şîrove kirin.

Endamê TEV-DEMê Aldar Xelîl: Em ê sîstema federalîyê ava bikin

Endamê TEV-DEMê Aldar Xelîl derbarê civîna federalîzmê de axivî û bal kişand ser yekemîn civîna ku di 17ê Adara 2016an de hatibû pêk anîn û eşkere kir ku ji 17 Adarê vir ve jibo federalîzmê hin xebat hatine meşandin Wê demê ji kurd, ereb, sûryan, aşûrî, ermen û tirkmenan komîsyonek hatibû ava kirin û jibo amedekarîya sîstema federalîzmê peyman hatibû vajo kirin. Herwiha wê çaxê di encama civînê de jibo Sûrîyê projeya federalîzmê hatibû pêşniyaz kirin.

Xelîl di berdewemîya axaftina xwe de got: “Em îro dikarin li herêmên ku di dest me de ne, sîstema federalîzmê damezrînin. Em jibo Rojavayê Kurdistanê û Bakurê Sûriyê xwediyê derfeteke wiha ne. Di vê civîna dawîyê de jî jibo vê modela li herêmên din jî bê çê kirin, me peyva Rojavayê derxist. Em dixwazin li ser vê herêmê hemû gel bi hev re bijîn û jiyaneka hevpar hebîn. Li ser Bakurê Sûriyê kurd, ereb, tirkmênan, suryanîyan dê bi hev re wekî federe xwe bi rê ve bibin. Ji ber vê jibo pêşxistin û xurtkirina sîstema neteweyê demokratîk di şûna navê erdnîgarîya herêmê, yan navê mîlletekê yan neteweke de, me ev nêrîn pêşkêş kir, da bi vî awayî li hemû cihên Sûriyê sîstema federalîzmê bi rehetî bihête saz kirin.”

Em naxwazin Sûriyê parçe bibe

Aldar Xelîl derbarê gotinên parçebûna Sûriyê de jî axivî û da zanîn ku ew ne alîgirên parçebûa Sûriyê ne û naxwazin Sûriyê parçe bikin, ew naxwazin niha gavekê biavêjin û ew gava wan bibe sedema parçebûnê.

Herwiha bi navê sîstemê yekîtîya Sûriyê dê bê parastin û wekî Bakurê Sûriyê bi tevahî herêmên kurdan, suryan, ereb, tirkman û ermenan dê bibin herêmên federal. Bi wî awayî yekîtîya Sûriyê û gelan baştir bihête parastin û gel dê bi rehetî bi hev re jiyana xwe berdewam bikin.

Herwiha Xelîl liser vekişandina YPGê jî axaft û wisa pê de çû: “Ti agahiyek neketiye destê me ku rejîmê xwastibe YPG derkeve û hişyarî kiribe û ji YPGê daxwazeka wisa kiribe. Halê rejîmê ji wê re bes e. Rejîm ne di wê astê da ye ku YPGê tehdîd bike û ji YPGê daxwaz bike ku ji wan herêman derkeve. Rejîm bi zorê herêmê xwe bi rê ve dibe. Ew nikare herêmên ku di destê YPGê de ye bi rê ve bibe. Niha li herêmên din yên Rojavayê Kurdistanê rêveberîya xweser û yekîneyên parastinê li hemû deveran hene û li wir jî hene. Rejîm ne xwedîyê wê erkê ye ku bikare îro tiştekê wisa bixwaze. Rewşa wê rê nade ku beranberî kurdan xwe têxe şer û pêvçûnekê.”

Hevdîtinên Astanayê jî wê ne serkeftî bin

Aldar Xelîl bal kişand ser hevdîtina Astana û polîtîkayên Tirkiyê û eşkere kir ku polîtîkayên Hikûmeta Tirkiyê yên Sûriyê gelekî şaş in. Çawa hevdîtinên Cenevreyê û helwesta Tirkiyê bi ser neketin û bûn sedema qeyranan. Jiber vê Tirkiyê hertim hewl dide krîza Sûriyê mestir bike û di navbera gel û pêkhateyên Sûriyê de nakokîyan berfrehtir bike û şer û nakokîyan pêş bixe.

Xelîl axaftina xwe wisa bi dawî kir: “Berê civînên Cenevreyê jî, Tirkiy û Qetere îsrar kirin ku nûnerên gelên kurd di nav wan hevdîtinan de tunebin. Lê me dît ku Cenevre têk çû. Li Qezakistanê bêyî me ti diyalogek bi ser nakevin, ji ber ku nûnerên gelên aktîv û pêkhateyên wê di nav wan civînan de tunebin û ji şûna wan kesên ku li derveyê Sûriyê dijîn beşdar bin, encama wê jî dê wekî Cenevreyê bibe.

Hevseroka Meclisa Efrînê Hêvî Mustefa: Heger rejîm bixwaze naxwaze, YPGê vedikişe

Hevseroka Meclisa Efrînê Hêvî Mustefa rewşa Helebê û helwêsta rejîmê ji BasNewê re nirxand û diyar kir ku Heleb hat rizgar kirin. Xelkên wê derê ketibûn bin ambargoyeka dijwar. Liser daxwaza gel, hêza me 6 tax rizgar kirin. Êdî hêdî hêdî li wir meclîsa wan tê damezirandin û asayîşa wan tê çê kirin. Em wekî Efrînê jî alîkarîya gelê wê derê dikin. Me dît ku çawa zor û zehmetî û birçîbûn hebû. Pîştî YPG ew der rizgar kirin, jiyana wan hat guhertin. Xelkê wê herêmê asayîş û meclîsa xwe çê dikin. Em tecrubeya xwe bi wan re parve dikin.

Ev propaganda dijmênên me ne

Mustefa bal kişand ser xurtbûna şer û axaftina xwe û wisa domand: “Ji aliyê din ve êriş xurt dibin. Ji ber ku dijmin naxwaze projeya me ya federalîzmê pêk bê, êrişên xwe jî xurttir dike û bi taybetî dagirkirina dewleta tirk li derûdora me freh dibe.”

Mustefa derbarê vekişîna YPGê de axivî û eşkere kir ku hin kesan digot ku rejîm dê Helebê bigire û bizivire. Rejîm êdî ti carî wekî berê nîne û nazivire û mafê rejîmê jî tuneye ku bibêje, ji wê derê derkevin. Wekî Girêspî, Menbic ku deverên hatin rizgar kirin, YPG jê vedikişe û radestî xelkê wê derê dike. Meclis û asayîşa wir tê ava kirin. YPG di nav sivîlan de namîne û YPG ticarî di nav sivîlan da nemaye. Heta niha li Efrînê jî YPG di nav sivîlan de tuneye. YPG li enîyê ye û dê li enîyê bimîne.

Kurd di nav du vatişên nakok de:

Netewe-dewlet yan xweserî-kommunalîsm I

XALID XEYATÎ

Bi awayekê giştî mirov dikare bibêje ku îro di pantaya cografyaya siyasî ya Kurdistan de, ku diaspora kurdî jî beşek jê ye, di peywendî bi dahatîya kurd û garantîya mayîn û geşekirina vî neteweyî wekî diyardeyeka zanavî, zimanî, civakî, siyasî û aborî di çarçoveya çar welatên desthilatdar ên wekî Tirkiye, Îran, Sûriye û Iraqê de du vatişên siyasî bi hev re di milmilanê de ne. Ev du vatiş ku zêdetir berhema helwêsta siyasî, realpolitîsm û manifesta ideolojika hizbî/rêxistnî ya di nav proseya siyasetê de dîroka hevçerx a kurd in, di cewherê xwe de ne tenê tevgera siyasî ya kurdan di astê fikrî-hizrî de tûşî şêwazeka polarizasyon, dabirrîn, milmilane, nakokî û destebendî kiriye, lê herwiha rîska lihevketina fizîk û çekdarî di navbera partîyên kurdî de bi şêweyekê berçav bi hêz kiriye. Bi şêwazekê sadekarane em dişêyn bibêjin ku di vatişa yekem de dewlet-netewe û pratik û hizra dewlet-netewe mihwer e û di vatişa duyem de modela xweserî/kommunalîsm û darûxana çemka dewlet-netewe dibine xala girêkî (nodal point) yan fraz û çemkên navendî jibo diyarkirina hêlên giştîyên vatişê.

Armanca vê nivîsê ne ew e, ku biçe ser hûrgiliyên nakokîyên henûkeyî û polarizasyona nihoyî û rîska têkhilçûnê di nav xebata siyasî ya kurd de. Bi heman şêweyî vê gotarê nevêt bi ser proseya dirustbûn yan nedirustbûna netewe-dewletê di nav kurdan de bipeşke. Lê armanca sereki ya vê nivisê li vir berjestekirina taybetmendîyên van her du vatişan û bi heman teherî argumentasyon û sempatinîşandan bi qazanca vatişa netewe-dewletê ye. Hêjayî amajeyê ye, ku modela netewe-dewletê-mihwer niha jî tevî bênetewayetîyê li derveyî jêxwandina ku ez liser dikim, xwe wekî vatişeka yekgirtî bo vê ewirê pênase dike. Ev modela bilî hindek jêxwandinên siyasî yên jihevçiriyayî li vir û li wir, nekariye jibo aligirên xwe bibe çavkanîya hizrî/ideolojik ku bo nimûne çima serweriya siyasî û bi heman teherî dewlet-netewe dikare bibe parêzer û dabînkerê mafê binereti yê hemwelatîbûnê di nav kurdan de; mafê ku çar warên giring ên medenî, siyasî, civakî û kulturî-zanavî di xwe de hildigire. Berovajî, çavkaniyeka bihêz ya hizrî û rêxistinî li vatişa xweserî-kommunalism û "antî-netewe-dewlet-mihwer" e.

Taybetmendîyên vatişa xweserî-kommunalîsmê

Kes û rêxitinên ku îro vatişa "antî-netewe-dewletê" bi pêş dixin û liser wî bingehî têgeha netewe-dewletê bo dahatîya siyasî ya kurdan wekî amrazekê "ziyander" wêne dikin, di radeya yekem de azmûnên nerênî yên netewe-dewletê dikine binemayê meşrûiyeta vatişa xwe, binemayê ku di astê îdeolojik de barekê bihêz yê anarşistî heye. Ev nêrîn ku de seretayê de ji aliyê diroknigar, niviskar û xebatkarê kevnekommunîst ê amerîkan, Murray Bookchin (1921-2006) ve hatibû gelale kirin û paşê ji aliyê Abdullah Ocalan, serokê bendkirî yê Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) ve hatiye berfreh kirin, dewlet-neteweyê jibo rêxistina jîyana siyasî, kulturî û civakî wekî model red dike, jiber ku di radeya yekem de ya ji wî ve, projeya netewe-dewletê karkirdeka baş nebûye û di encamê de zerûreta dîrokîya xwe ji dest daye. Aligirên vê nêrînê ku hin modelên alternatîv wekî kommunalism, xwebirêvebirina demokratîk, civaka demokratîk û hwd di şûna netewe-dewletê de pêşniyaz dikin, wisa diramin ku dewlet-netewe bêhtir berfrehkerê projeya cihanîkirina kapitalismê bûye, ku wê jî cewher û siruştekê çewsîner heye, ku taybetmendîyên takane û kollektîv yên mirovî têde dikevine xizmeta kapîtalisma cihanî û dî akamê de ji pêşkeftin û geşekirin dikevin. Ligor vê ruwangehê, bi taybet jin wekî nîvê civakê nikare erka xwe wekî tevgêra sereki ya dîrokê di civakê de bi cih bihîne û ji lewre marjinal dibe û dikeve perawêza sistema mêrsalarane.

Bi merema çareserîya demokratîk ev modela hem di astê birêvebirina civakê de hem jî di astê hêma û sembolîk de alternatîvên têvel û pircûre pêşniyaz dike. Jibo nimûne avakirina pêkhate û navendine xweser derveyî dêsmana dewletê, dikare berjewendîyên "gel" di astên têvel ên civakê de biparêze û geşe bi wan bide. Ev berjewendî ku karakterê wan yê civakî, aborî, zayendî, kulturî û siyasî yên têvel hene, dikarin di heman demê de hilgirê hêma, sembol û alayên ciyawazê ên xwe bin, herçende ligor vê vatişê ev hêma û sembol tefsîrê ji berjewendîyên kapîtal û modela netewe-dewletê dikin, divêt bihêne red kirin yan wekî dihête gotin bihêne diskalifiye kirin.

Ji perspektîveka dîrokî ve, aligirên vatişa xweserî-kommunalismê derdibirrin, ku proseya netewe-dewletê wekî projeyeka hegemonîk û tekrehend ya kulturî hem di astê navxweyî û hem di çarçoveyên fermî yên saziyên dewletê de, hem jî di astê peywendîyên navdewletî û navneteweyî de bûye afrînerê hin karesatan û ji lewre israr liser heman azmûnê dûbarekirina van karesatan (b.n. şerên cihanî yên yek û du, holokasta cihûyan, jenosîda ermen û kurdan û hwd) riskeka berdewam di nav xwe de perwerde dike.

Di hevebenda gelê kurd de, pirsa yekbûna navxweyî yan neteweyî di perspektîveka berfrehtir de wata peyda dike. Li vir, meydana tevgera neteweyî ya kurd berdewam dihête rojane kirin, daku rê liber projeya sereki ya vê modelê negire; projeya ku gelek caran bi heybeta diruşmine wekî bratîya gelan, demokratîzekirina Rojhilata Navîn û herwiha komara demokratî xwe berceste dike. Jiber hindê ye, ku arşîtekt û endazyarên projeya xweserî-kommunalismê pir hişyar in, ku fezayên giştî (kamu alanı) yên civakê jî aliyê vatiş û sembolên aliyê rikaber, ku ew wan wekî nasyonalistên sereteyî pênase dikin, nehêne dagîr kirin. Bo nimûne, jiber vê çendê ye, ku li Rojavayê Kurdistanê yan li cihên ku desthilata damezrayî derfet bide, ne tenê piştgîrî li ala Kurdistanê û çalakîyên nasyonalistî dihête kirin, tenanet di hindek qonaxan de digel partî û rêxisitnên siyasî-medenî yên ku wan bi xwe damezrandine re dikevin nakokî û milmilanê. Liser Başûr, pirs û projeya referandum û serxwebûnê wekî hewleka neguncaw û nehevxwan digel projeya demokratîzasyona navçeyê pênase dikin û di baştirîn haletê de, avakirina netewe-dewletê li vî parçeyî wekî amrazekî bo parastina sistema gendel û dijejin û herwiha parastina berjewendîyên siyasî û aborî yên malbata Barzanî biçûk û bêqîmet dikin.

Taybetmendîyên vatişa netewe-dewletê

Di hêla teorîk de, pirsa netewe-dewletê peywendîyeka rasterast bi têgeha serweriya siyasî re heye. Serweriya siyasî ku di rewşa herî bilind de xwe wekî netewe-dewletê berceste dike, mafekê gerdûnî ye, ku komek qanûn û zagonên navneteweyî, bo nimûn Ius Gentium (qanûna neteweyan) meşrûiyetê didê. Bi watayeka din, her neteweyeka ciyawaz, evca bindest be, yan jiber çi hokarî dibe bila bie, heger bixwaze jibo pêkhînana dewleta serbixwe gavan biavêje, ev qanûn rê didê. Bi awayekê dîrokî û klasîk, serweriya siyasî di peykerê hakimekê mutleq ya wekî Thomas Hobbes (1588-1679) di pirtûka Leviathan de dibêje dihête garantî kirin. Samuel von Pufendorf (1632-1694) serweriya siyaskî wekî mafekê siruştî yê mirovî pênase dike. Di dîroka hevçerx de hebûna serweriya siyasî ku heman Ius Gentium e û garantîya man û bûna bidestên serwerî ye, ku di peykerê netewe-dewletê de xwe berceste dike. Di astê dîroknigarîya hevçerx de pêdivî ye bihête gotin ku îro hejmara van netewe-dewletên ku endamên NY ne digihîje 193an. Pêşmercê damezrandina yek ji van netewe-dewletan jî hebûna demokrasî û mafê mirov nebûye, jibil welatê Swisê ku heta radeyekî berhema kartêkerîya civaka sivîl e. Dîroka avakirina netewe-dewletê ku di bineret de deravêta proseya modernîte û geşestandina kapîtalismê ye, proseyeka bi êş û azar bûye. Vê proseyê geşestandineka bêreje ya kapîtalismê, şerên cihanî û navçeyî, qeyran û serkutkirina navxweyî, asimilekirin û helandina kultur û zimanan û tenanet gelkuji û jenosîd jî bi xwe re aniye.

Di her hal û karî de, welatên rojavayî piştî CCII gihîştin wê qenaetê ku jibo hetahetayî dawî bi şerî bihînin û rêya aştî û pêkvejiyanê bidine ber xwe. Jiber hindê proseya demokrasikirina dewlet û dezgehên wê dest pê kir. Bi vê armancê ev welat piştî CCII vegeriyan çavkanîya renesans û şaristanîya yûnanî û ji hemiyan giringtir afrandina hemwelatîyekê nû kirin hêmayê serekî yê netewe-dewletên xwe. Hemwelatîyên vê carê ku di berawird bi subjekt û tebeeyên berî xwe cudahîyeka binereti hebûn, êdî bi erka xwe jibo netewe-dewletê ve nedihatin girê dan, lê sê mafên şengistî yên medenî, siyasî û civakî bûn, ku çarçoveya wefadarî, pêbendî û girêdana hemwelatî bi netewe-dewletê re diyar dikir. Di rastîyê de, ew mafana bûn ku serweriya siyasî ya neteweyê hilguheste naxê her ferdekê civakê û bi heman awayî ji hemwelatî bûne xwedîyê proje û berhemhînerîya civaka şêwirandîya xwe. Parallel bi geşestandina navxweyî û disan bi mebesta seqamgîriya aştî û pêketina siyasî, aborî, kulturî û civakî gelek projeyên têvel yên hevkarî û hevpeyvanîyê di navbera van welatan de pêk hatin. Yekîtîya Ewropayê ku îro bist û heşt endam hene, yek ji van projeyên giring e, ku divêt bihête amaje kirin. Divêt ev rastîya jî bihête rader kirin, ku projeya netewe-dewletê bi hinavekê demokratî ve, ji mêj ve sînorên welatên rojavayî cihde hîştiye û wekî zerûreteka gerdûnî li kişwerên Afrîqa, Asya, Okyanûsya û Amerîkaya Latîn belav bûye. Hindûstan bi şêniyekî zêdetirî milyardekî nimûneyeka serkefti ya vê azmûnê ye.

Beşa din duyem a makaleyê wê di hejmara bê ya heftenameyê de bê belav kirin.

Îmaja kurdan di dîroknigarîya dewletgerane de; Mînaka Simko

KEMAL SULÊMANÎ



Ev vekolîn lêhûrnêrînek e liser serhildana 1918-1922an ya Îsmaîl Axayê Şikak (yan Simko) li Kurdistana Îranê û awayê ku ew di dîroknigarîya farsî de hatiye portre kirin. Wênekirina Simkoyî wekî serekekê dinê isyankar yê kurd, ku ti daxwazên etnîk nebûn, gelek pirsên giring bêbersiv dihêle. Simkoyî di dîroka siyasî ya kurdan li Kurdistana Îranê de çendîn yekemîn helmet dan dest pê kirin, lê bi rexma hindê nûhînerîyên wî bênirx hatine hilsengandin. Simko ji têvelîyên komunal haydar bû û dizanî ku ev têvelî meşrûiyetê dide radeyên cuda yên xwe-rêveberîyê. Zêdebarî helmetên siyasî û eskerî, Simko yek ji damezrênerên sereki yê yekemîn xwandegeha kurdî li Îranê bû, yekemîn rojnameya kurdî-farsî li Îranê wî weşand û herwiha wî kurdî kire zimanê fermî yê hukimranîya xwe. Ev vekolîn liser binemayê bîrewerî, saloxetên şexsî û dokumentên nelêkolayî yên destê yek hatiye encam dan, daku ku wêneyekê komplekstir ji berxwedana Simkoyî nîşan bide, hindek boçûnên xwedêgiravî pejirandî liser Simko û etno-nasyonalîzma wî problematîze bike û nelihevbarîyên cûrbecûr ku di saloxetên fermî û nefermî yên dîroknigarîya serdest de hene raxe ber çavan.

Sereta

Cexta sereki ya vê vekolînê liser serhildana Îsmaîl Axayê Şikak, yan wekî bêhtir naskirî bi navê "Simko", û hewlên wî jibo damezrandina herêmeka otonom e. Herwiha dê bihête diyar kirin ka gelo ew çawan di dîroknigarîya farsî de hatîye portre kirin. Zêdebarî helmetên siyasî û eskerî, Simko bi şirîkatî yekemîn xwandegeha kurdî li Kurdistana Îranê da vekirin, yekemîn rojnameya kurdî-farsî weşand û kurdî kire zimanê fermî yê tixûbên desthilatdarîya xwe. Qonaxa serhildana wî bû bingehê hevrikîya navbera vegêrrana serdest ya dewletê û vegêrrana serdest ya nasyonalîtên kurd li Îranê. Bi dû vê re, di qonaxa dûyem de gava ku dewletê hewla yekxistina sînorên coxrafîk û siyasî da, kurdan bi rexma nebûna îdeolojî yan projeyeka hevgirtî, li hember van hewlan li ber xwe da. Di halê ku dewleta Îranê û yên din hêza eskerî, aborî, muesseseyî, kulturî û perwerdeyî ya xwe ya mezin jibo bedianîna projeyên xwe yên homojenîzekirinê mobilîze dikir, aliyê kurd, jiber ku şiyana bikaranîna potansiyela navxweyî nebû, bertekên dabirîyayî nîşan dan yan jî ti derfet jibo wergirtina piştgîrîyeka derveyî ya rasteqîn peyda nekir.

Xiyaba rewşenbîrên xwemalî yên bihêz yên kurd dikare wekî mestirîn kêmasîya berteka kurdan lihember projeyên nasyonalist di hevebenda îranî de bihête hejmartin. Ev qonax bi damezrandina Komara Tirkiyê di sala 1923:an de û destpêka selteneta xanedana Pehlewî ya sala 1925:an li Îranê re hemkat bû. Di her du haletan de, van dewletan, bi hêvîya jinavbirina derfetên derbirrîna cudahîyên kulturî û etnîk, fezaya siyasî bêreje bertesk kirin û vatişeka dergir, ku jibo komelgehên etnîk ziyanmend bû, hilbijartin. Van her du netewe-dewletan erka tekrengkirina gelên xwe dane ber xwe, û di pratikê de encama vê helmetê di nav tixûbên erdî yên dewletê bixwe de dinê(n) nexwastî û menfûr afirandin.

Di her du hevebendên îranî û tirkî de, encama vê yekê, anegorî tedbîrên ewleyî yên van dewletan û siyaseta tahta kapı (derîyê texte) bû egerê domandina rakirina fizîkî û nefîkirina grûpên etnîk. 1 Vatişên van dewletan bi pirani bi aurayeka biyopolîtîk û mîlîtarîst di navbera salên 1900 heta 1930:an de hatine teşe girtin û dariştin, ku her yek ligor hevebendên xwe gihîştin rêjeyên têvel yên xestîyê. Li vir vegêrrana fermî û dîroknigarîya bi palpiştîya dewletê wekî hev dihêne destnîşan kirin. Ev vekolîn bi ser çend vebirkan de hatiye dabeş kirin, ku têde hem nasyonalîzm dihête pênase kirin û hem jî hevebenda dîrokî ya helmetên siyasî yên Simko digel peywendî û nakokîyên wî bi komelgehên ne-kurd re dihêne rave û şirove kirin. Herwiha, bi awayê ku îranîyan bi doza Simko re serederî kirine, ezê dê awayê ku wan di dîroknigarîya xwe de bi siyaseta kurdî re serederî kirine, bêxime ber tîrêjên twêjînê.

Nasyonalizm û Simko

Liser têgeh û arîşeyên herî giring ên nasyoalîzmê rêkeftineka akademîk tune. Hutchinson û Smith radigihînin, ku "renge dijwarîya navendî ya etûda netewe û nasyonalîzmê kêşeya peydakirina pênaseyên libar û rêkefti liser têgehên kilitî yên netewe û nasyonalizmê"2 bi xwe bin. Karbirda giştî ya çarçoveyên berfreh gelek caran arîşeyên din di rastîya dîrokî ya wan çarçoeyan de diafirînin, ku bêhemdî, çavpoşî li xweserîyên doz û tevgerên nasyonalist dike. Benedict Anderson amajeyî alozî û kompleksîteya nasyonalizmê dike, ku diyardeyek e, ku li herderî heye, lê li herderî jî taybetmendîyên lokal ên xwe radigire.3 Smith, berovajî Gellner, îdîa dike, ku jiber lihevnegirtineka mezin di feza û qonaxên dîrokî de, gihîştin bi teorîyeka giştî ya nasyonalizmê estem e.4 Herwiha, "nasyonalizmên têvel yên ne-rojavayî paşê verziyonên lokal yên heman vegêrranê berhem dihînin û bi avakirina navendeka herêmî, wê dikine cihgirê 'Ewropayê'"5

Gava ku gengeşe dihête ser seretaya nasyonalîzma kurd yan ka kîjan serhildan û helmeta siyasî ya kurdî dikare wekî nasyonalistî bihête destnîşan kirin, babet hîn bêhtir aloz dibe.6 Lêbelê, li vir, wekî herderî, em nasyonalîzmê wekî konvasyoneka modern pênase dikin, ku ligor wê 'komelgeheka sêwirandî' doza mafê 'neteweyî û hemawa' (ligor goteya bi navûdeng ya Gellner) dike.7 Liser binemayê vê konvansiyonê, xwe-merce'iya komunal di ketwarê de, bingehên rewa yên daxwazên komunal û siyasî û doza xwe-rêveberîyê pêk dihîne.8 Ji lewre, her îdîa yan "derbirrîn, dînî yan bi teherekê din, ku mafên kollektîv bi xwe-merce'iya komunal ve girê bide modern û nasyonalistî ye, û dikare di paradîgma siyaseta nasyonalistî de bihête danîn. Bi heman şêweyê, ev vekolîn Simkoyî datîne nav tixûbên etno-nasyonalîzma kurd. Siyaseta wî nîşan dide, ku ew ji têvelîyên komunal haydar bû û dizanî ku ev têvelî meşrûiyetê dide radeyên cuda yên xwe-rêveberîyê. Di maweyê şanzde sal xebatên siyasî de gelek guhertin di siyaseta Simkoyî de diyar dibin. Lêbelê, wekî pêştir hate amaje kirin, herçende rola wî wekî pêşengê gelek yekeman di dîroka siyasî ya kurdên Rojhilat de ne cihê gengeşê be jî, lê nûhînerîyên wî li ber çavan nehatine girtin. Simko berhema serdema xwe bû; li herêmekê hatibû dinyayê ku bi nakokîyên etnîk û dînî mişt bû. Lê Simko ji siyaset û trendên siyasî yên biryarder yên serdema xwe agehdar bû.

Ev vekolîn lê dixebite bipeyitîne, ku wênekirina Simkoyî wekî serekekê dinê isyankar yê kurd, ku ti daxwazên etnîk nebûn, gelek pirsên giring bêbersiv dihêle. Bo nimûne, mirov dikare bipirse, Simkoyî çima yekem xwandegeha kurdî li Rojhilatê damezrand? Çima di şûna farsî de xwandegeh bi kurdî da vekirin? Heger kurdî nehatibû standardîze kirin û astê xwandewarîya kurdan di kurdî de ji farsî lawaztir bû, Simko çima rîska weşandina rojnameyeka bi kurdî û farsî da ber xwe, nemaze heger ti qazanceka aborî têde nebû? Motîvasyona hilbijartina zimanê kurdî wekî zimanê fermî yê herêma hukmranîya wî çi bû? Di beşên din de, ev vekolîn dê bi gengeşekirina mînaka Simko ronahîyê bièxe ser berxwedana kurdan a seretaya sedsala 20an li Îranê. Em dê nîşan bidin ku vegêrrana dewletger çalakane lê xebitiye berxwedana kurdan wekî dinekê menfûr portre bike; û em dê rave bikin gava ku mirov çavkanîyên kurdan dide ber çavan, rûberê vîzyona Simkoyî bixwe liser neteweyê kurd derdikeve holê, ku têde helmet û motîvasyonên wî hevgirêdayîbûneka berfrehtir rader dikin.

Jêrnot

Cf. Kaveh Bayat, "Riza Shah and the Tribes: An Overview" in Cronin, Stephanie. (ed.) The making of modern Iran: state and society under Riza Shah 1921–1941. London: Routledge Curzon, 2003.

2 Jêgirtî ji N. Wayne, Nation-building, Federalism, and Secession in the Multinational State (New York: Oxford University Press Inc. 2006), 26.

3 Cf. Benedict Anderson, Imagined Communities: Reflections on the Origin and Spread of Nationalism, Rev. and extended ed. (London, New York: Verso, 1991).

4 Cf. David McCrone, The Sociology of Nationalism: Tomorrow's Ancestors, International Library of Sociology (London and New York: Routledge, 1998), 11–17.

5 Dipesh Chakrabarty, Provincializing Europe: Postcolonial Thought and Historical Difference (Princeton: Princeton University Press, 2000), 7.

6 Cf. Abbas Vali, Essays on the Origins of Kurdish Nationalism, Kurdish Studies Series (Costa Mesa, Calif.: Mazda Publishers, 2003).

7 Jibo agehîyên zêdetir binêre Kamal Soleimani, Islam and Competing Nationalisms in Middle East (Liber çapê, Palgrave).

8 hwj.

Psîkolojîya civakî û kultura hakim û mehkûm li Îranê

BEHRÛZ ŞÛCAÎ

Îrana kevin ya dûdmanî frezi-man, frekultûrî û fredînî bû; frerengîya Îranê tenanet di vatîşa fermî ya hukimranên îranê de dihate derbirrîn. Bernivîsên şahanî hemû gavê bi çendîn zimanan dihatine nivîsîn. Îran wekî wela-tekê konfederal dihate birêve birin; her herêmekê di qalibê satrapan de şahekê herêmî bi navê şehriyar hebû û li navendê şahê mezin yan şahen-şah hakim bû. Îrana ku heta 150 salî berî niha jî wekî welatekê nenavendî dihate bi rê ve brin, bi lasayî ji we-latên rojavayê kete qonaxa xudêgravî modernîteyê. Projeya modernîteyê, ku li ewropayê (sedsala 15 ta 19) serî hildabû wekî projeyeka afrandina civak û jikyaneka nû li hemû cîhanê belav bû, li îranê jî heruha. Yekî-neyên serekî yên vê projeyê biritî ne ji kapîtalîsm wekî yekîneya aborî, netewe-dewlet wekî yekîneya siyasî û nasyonalizm wekî yekîneya îdeolo-jîk. Di hevtevna îranê de bi taybet di seretaya serdema destihlata Pehlewî da, projeya avakirna netewe-dewleta Îranî pêkhatên herêmî kire arman-ca hêriş û çewsandineka bê pêşîne. Hewla serekî ya vê projeyê dariştî-na monîzmeka (tekrengî) kulturî û etnîk bû. Lê ev helmetên afrandina netewe-dewleta Îranê anegorî rê-bazên dewletên kolonyal ticarî digel ketwarê frerengê Îranê neguncaye, herçende nasyonalistên îranî hewl dan boçûna wererger (evolusyonist) a axayên xwe yên kolonyal bi ser Îranê de bisepînin; wate anegorî îdeolojîya sosyaldarwînizmê serdestya neteweyê fars bi ser pêkhatên din yên neteweyî yên Îranê de sepandin. Hîn jî boçûna ku divêt ew axa bin, bi vê yekê rewa dikin û meşru'yetê didinê, ku gûya ew di nav kêmîneyên bed-guncaw de grûpa qenc-guncawe. Herwekî netewe-dewletên modern li Rojavayê xewna afrandina civakeka hevreng û homojen û bedeneyeka neteweyî ya şayîkkirî ku pêk hatiye ji hemwe-latiyên ku xwedêgravî heman dîrok û kultûrê parve dikin û lihember siyaseta ku wan bi rê ve dibe wefadar in, dibînin. Bîrewer û siyasiyên fars, ji çep û rast, ji liberal heta dîndar wisa hizir dikin, ku divêt gelên perawêzan yên wekî kurd, belûç, turkmen, qeşqayî û 'ereb ji havîbûna xwe bihêne derêxistin û di hevîrekê tekreng yê ku ew disêwirînin îraniyê pakij û meşru' e de bihêne pişaftin. Di lêgerîna xurtkirina netewe-dew-leta xwe de farsan tixûbên xwe wekî rêbazên dewletên emperyalist berf-reh û militarîze kirine; wate sînorên nasyonalizm û emperyalizmê li hev şêlû kirine. Mêgalomanya farsî jiber vatişê dirokgerayane ya nasyonalistên fars herku diçe kûrtir dibe. Ligor vê vatişê bi baweriya nasyonalistên fars gelê ku xudan dîrok û şaristaniyeteka kevnar e, mafekê siruştî yê terîtuar (xak) û dewleteka xweyî heye; di hember de grûpên din yên etnîk-ne-teweyî li Îranê divêt bikevine bin hukim û sulteya "neteweyê dîrokî yê fars". Ji lewre, tevgerên siyasî yên fars li ser wê baweriyê ne, ku mafê wan yê rewa ye ku hakimên ebedî yên Îranê bin. Rêxistinên Îranî yên opozîsyonê, ji lîbral, komarxwaz, millî-mezhe-bî bigire heta monarkîst û çepan, herçende qala demokrasîyê bikin jî, di xalekê de hevhizir in; ew wekî fars xwedan û hakimên vî welatî ne û mafê diyarkirna çarenivîsê bo kêmî-neyên neteweyî înkar dikin û ligor baweriya wan divêt serwerî di qalbê dewleta navendî di nasname û zanavê fars de bihête şidandin. Boçûna van rêxistinan liser mafên neteweyî jibo kêmîneyan ji boçûna Komara Îslamî ya Îranê ciyawaztir nîne. Hewla serekî ya opozîsyona Îranê rûxandi-na rejîmê, lê lîser çemka serwerîyê parastina statu-ku li Îranê ye.

Psîkolojîya civakî ya fars û kurdan li Îranê

Jibo ku fezaya demokratîk û tolerant jibo çareserkirna pirsa kêmenetewe-yan li Îranê çê bibe divêt werçerxa-neka binereti di hişmendiya civakî ya fars û kêmeneteweyên wekî kurd bixwe de pêk bihêt. Ango zemîneya sosyopsîkolojîk ji bo peyrewkirina projeyeka jinavendkirina serweriya syasî bihête amade krin. Lê gelo ti asoyeka wisa di psîkolojîya civakî ya fars û kêmeneteweyên wekî kurdan de diyar e?

Bi dirêjahiya dîrokê, vatişa fermî li Îranê hişmendîyeka sexte hem di nav kurdan û hem di nav farsan de çê kiriye, bêy ku kultura siyasî û civakî ya farsan verave bike. Ev hişmendîya sexte birîtî ye ji hilgirtina baweriyên sexte û nerrast ku dijberî berjewen-dîyên objektîv yên civakî yên ta-kekesan, ku herwiha dibe handerê çewsandin û neyeksanîyê di civakê de. Her bi wî teherî, ligor vê pênaseyê, grûp yan takên mehrûm (bixwîne kurd) jî dibine xwedanê hişmendîye-ka sexte, ku ligor wê- wan bixwe jî bawer e - ku kêmtir û li xwartir in; ji lewre, di hîyerarşîya civakî de layiqî pêgeha xwe ya îtaetkar û tabî' in.

Di binhişê kurdan de baweriyeka nepenî bi berzî û bilindîya grûpa hakim (fars) bi ser grûpa pest û xwar (kurd) de heye. Vê baweriyê rê daye afrandina klîşe û stereotîpên hev-razîker , ku bi teherekî grûpa hakim (fars) û grûpa mehrûm (kurd) pênase dike, ku pergala civakî ya mewcûd – bi hemû rêjeya newekhevîya xwe ve – wekî pergaleka meşrû' û tenanet siruştî dipejirîne. Jibo farsekê navincî siruştî ye, ku welatê wî xwedanê pê-naseyeka farsî ye û xwedanê rasteqîn yê wî welatî fars e, jiber ku – bi tebîra wî – ev der ji "qedîm el-eyyam" ve welatê wî ye, jilewre kurd û gelên din li Îranê belaya serê wane, ku divêt yan ji holê rabin û yan – di haleta herî baş de – xwe ligor helûmercan biguncî-nin (angu bihêne pşaftin). Kurd, hem anegorî boçûna farsan hem jî anegorî boçûna kurdan bixwe, ku bi ser wan de hatiye sepandin, berdewam ji far-san kêmzekatir, neşiyawtir û paşketî-tir dihêne pênase kirin. Klîşeya herî berbelav di nav farsan de pênasekirina kurdan wekî wehşî ye. Ev klîşeyên derpergali yên hevtemamker hander in bo hindê ku piştgirîya etnîsîteya fars jibo "statu-kû" û rewadîtina sîstemê zêdetir bibe. Helbet, akamên dirêjxayen yên vê rewadîtina sîstemê jibo herdu grûpan ciyawaz in; herçî fars in hest bi zêdebûnekê di xwe-baweri û bextewerîya subjektîva xwe de dikin; ji lewre bo wan sîstema heyî rewa û meşrû' dihête hest kirin û her-çî kurd in, ku divêt meşrûiyeta xwe di nav sîstemê de bikirrin, duçarî kêm-bûna hesta xwebaweri û bextewerîya subjektîv dibin û ji lewre, boçûneka dudilane lihember endametî di nav grûpa xwe ya etnîk da hildibijêr in.

Kurt û kurmancî bi kurdbûna xwe stîxwar û şermezar in. Vê hişmendîya sexte kartêkerîyeka mezin liser psîko-lojîya kurdan kiriye; tenanet heta vê dawîyê tevgerên kurd li Rojhlatê kêm caran rexne li serdestidya kulturî, civakî, zimanî û siyasî ya gelê fars li Îranê dikir. Çemka serwerîyê li Îranê ji aliyê tevgerên kurd ve bi degmen hatîye şirovekrin; herçende hindekan jibo gelê kurd daxwaza otonomî û diyarkirna mafê çarenivîsê kiribe jî, lê çemka serwerîya navendî kêm caran hatîye vekolîn. Otonomî yan xwerêve-berî dihête wataya hindê ku kiryarên her neteweyekê, di şûna ku bi ser de bihêne sepandin, divêt ji aliyê ne-teweyî bixwe ve bihête diyar kirin û biryar dan. Mixabin, hêj di psîkolojî-ya civakî ya kurdan de meyla hetero-nomîyê zêde ye, ku dijberî otonomîyê ye. Heteronomî dihête wataya birê-vebrin di bin destê "biyanîyan" de, ango ketin bin hukmê hindekan ku ne xweyî ne û jî "xwe" biyanî ne. Jibo kurdekê navncî ya normal ew e, ku hakim û serdest, ji wezîr û kizîr bigire heta memûr û karmendên rêjexwar yên dewletê, fars û 'ecem bin. Li beşên din yên Kurdistanê jî belkî bi vî awayî be. Di mentaliteya kurdî de ya ne-asayî hukimranî û fermanfermayî ya kurdan bi ser kurdan bi xwe de ye, ango bi kurmancî şexsiyeta xulamtîyê. Jibo ku hişmendîya farsan bihête gu-hartin, pêdivî ye berî hertiştî ew digel têgeha empatîyê aşina bin. Empatî proseyek e, ku têde divêt fars bikarin ji navendê ve hest, hisiyat û vegêr-ranên kurdan li cem xwe bisêwirînin. Yan wekî vekoler Gordon dibêje, divêt farsan di referansa îndeksîkal (amaje-ya bi hindê ka kî ravekerê vegêrranê ye) de sîmulasyoneka (şibandin) em-patîk hebin ku birîtî be ji werçerxa-neka îmajinatîv (sêwrandî), ku têde yê disêwirîne (fars) navenda nexşeya xwenavendîbûna xwe biguhere. Angu fars xwe daynin şûna kurdan. Heger em sîmulasyona empatîya farsan ve-kolin divêt em van pirsan bikin.

1. Gelo farsekê navincî halê derûnî yê kurdekî birîtî ji hizir û hestên wî dizane?
2. Gelo farsekê navincî halet yan mu-tabiqeta refleksên 'esebî ên kurdekî werdigire?
3. Gelo dikare, çawan ku kurdek hest dike, ew jî wisa hest bke?
4. Gelo fars xwe di rewşa kurdekî de dikare bisêwirîne yan hest bke?
5. Gelo fars dizane ka kurdek çawan hizir û hest dike?
6. Gelo dikare bisêwirîne heger di şûna kurdekî de bûya dê çawan hest bikira?
7. Gelo farsek dikare di dema şahidî-ya êşa kurdekî de hest bi xemgînî û perîşanîyê bke?

Dawî

Îran wekî destkirdeka siyasî û xudê-giravî netewe-dewlet jibo gelên xwe ne bi tenê merhemet yan parêzerê hemwelatîyan nebûye, belku ehrumek bûye bo çewsandin û pelixandona gel û hemwelatîyên xwe. Hafzeya neteweyî ya kurdan ji Îranê ('ecemis-tan) û Îranîyan ('eceman) ji ya farsan ji şengistê ve ciyawaz e. Di hafîza kurdan de Îran û Îranî dihête wataya teqîyye, xud'e û heqaretê. Futûhat, tesxîrat û îftxaratên îranî jibo kurda bêhtir dihête wateya çewsandin û talankirina kurda. Zihinyeta farsî, ya hakmîyet û gelê serdest e û jbo parastina vê hindê fars amade ne taybetmendî û xusûsiyetên xwe yên kulturî hercar bi kar bihînin. Çawan ku gelek caran lihember kurdan di sedsala 20-an de jî ev fendên xwe çen-dîn car dubare kirin. Robert Mignan, gerrokê sedsala nozdehan di gerrên xwe yên li Îranê de weha wesfa farsan dike: "Li 'Ecemistanê (Persia) derew û buxtan wekî kemalyatên moda rojê dihêne hejmartin. [...] Jibo menifeta xwe, zelamê ecem (Persian) amade ye serî li xirabtirîn cinayetekê bide – tenanet heger ti sebeb di navê de nebe jî kizb û derew bêasten ji dev û lêvên wî difûrin, [...] bi yek bêjeyî, karakterê wî pêk hatiye ji ezokî, hirs û teme, xedir û xiyanet, xapandin û za-limtîyê." (Robert Mignan, 1839:202) Ji sala 1839 heta vê gavê di karakterê neteweyî yê farsan de guhertineka berçav çê nebûye. Di sedsala bîstan de çend serokên kurd bi xapandin û lêbandin hatine kuştin. Hîn jî hu-kimdarên Îranê çewsîner, despotîk û zalim in. Hukumdarên Îranî mafê xwe yê rewa û siruştî dîtine û dibînin ku hemwelatî (farsan) û reyetên (kurd û kêmeneteweyên din) xwe tenbîh bikin.

Îran hingê dikare pirsên kêmene-teweyên xwe çareser bike, heger- wekî Jeremy Rifkin pêde diçe – bikare "şaristaniyeta empatîk" biafrîne, ku têde empatî şirêz û çespa civakî ye, ku bikare civaka welatî bi hev re girêdayî bihêle. Herwiha divêt bîrewer, tevger û siyasîyên Îranê têbighin ku kurdan yan kêmeneteweyên din yên Îranê – bêy înkara pênaseya neteweyîya wan - wekhevên farsan di her warê jîyana civakî û siyasî de bibînin. Vê gavê bîrewer, tevger, siyaset û siyasyên Îranê ne ev şîrêza civakî hene ne jî kultura siyasî ku bikarin dan bi mafên kêmeneteweyan bikin.

Sûka Hesinkeran bar dike

Sûka dîrokî ya Hesinkeran li Sûra Amedê bi hezaran sal e liser pî-yan e. Hosteyên hesinker ên mezin li vê derê fêrî hesinkerîyê bûne û bi hezaran salan den-gên hesinên hosteyên mezin li vê derê belav bûne. Lê ligor zanyarî-yan dengê hesinan êdî bar dike û diçe cihekê din.

SARA PIRANIJE

Berê Sûka Paqiran ... Niha jî Sûka Hesinkeran. Ev sûka dirokî li navçeya Sûra Amedê li cem Xana Sûlûklûyê ye. Sûk bi hezaran sal berê hatiye çê kirin. Dîroka wê ne diyar e. Hin kes dibêjin Hz. Davûd ava kiriye; hin kes jî dibêjin ewqas kevn nîne. Lê dîroka wê nedîyar be jî, berê hemû hesinên Amedê li vê sûkê dihatin çê kirin. Hesinkerî wekî hu-nerekê mezin dihête qebûlkirin. Ew hemû hesinên ku di avahîyên dîrokî yên Amedê de hatine bi kar anîn li vê sûkê hatine çê kirin. Li aliyê din ji berê ve hesinên çandin û heywanan li vê derê çê dibû. Ev nerîta hîn jî didome. Heta eşyayên zînetê jî li vê derê dihatin çê kirin. Berê li Amedê karê hesinker û hostetîya hesinkerîyê gelekî girîng bû û wekî adet dihat qe-bûl kirin. Jiber vê dîroka hesinkerîyê ewqas kevn e.

Ji aliyê din ve jiber ku karê hesin û hostetîya wê gelekî navdar bû, hos-teyên hesinker ên mezin ji vê sûkê derketine. Jiber hostetîya hesinkeran, hunerê hesinkerîyê gelekî girîng û di asteka bilind de bû, malbatan berê zarokên xwe didan cem hosteyên hesinker û li vê derê berdewam hosteyên hesinker peyda dibûn. Herwiha ne tenê zarokên misilman, ji dîn mezhebên din jî hoste hebûn. Ji wan yek jî 'Xalê Xaço' ye. Xalê Xaço di ware hesinkarîyê de gelekî navdar e. Dema ku Xaço zarok bûye, li Sûka Hesinkarîyê wekî şagirt dest bi kar dike û hêdî hêdî dibe hoste. Îro hîn jî wekî Xalê Xaço behsa gelek hos-teyan dihête kirin. Xalê Xaço gelek zarok perwerde kirine û ew kirine hosteyê hesinkarîyê. Ji aliyê din ve wekî wî gelekî hosteyên ermenî û cihû hebûne. Lê piştre yek bi yek ji sûka navdar a hesinkerî ya Amedê koç dikin û yan jî dimirin.

Herwiha hemû hosteyên sûkê xwede îmzeyên taybet in. Dema ku amûrekî çê dikirin, îmzeya xwe ya taybet diavêtinê. Ev îmzey wekî ga-rantî dihête hesabandin û ka ew hu-ner aîdî kîjan hosteyî ye diyar dibû.

Rewşa sûka navdar a Sûrê piştî sedsala 19an diguhere û makîne derdikevin û wan makîneyan hem erzantir û hem jî zêdetir berhem çê dikirin. Jiber vê hejmara hesinkaran kêm bibe, lê îro hîn jî li Sûrê dengê çakûçê hosteyên hesinker bilind dibe. Hoste li hesinên xwe dixin û berheman çê dikin. Lê xuya ye ku ev dê zêde nedome. Jiber ku îhtîmala barkirina sûkê heye.

Ligor zanyarîyan jiber ku dengê hesinan zerar dide avahîyên dîrokî, sûk dê bê bar kirin. Ji bo vê jî li-ser rêya Sêwrega Rihayê di Sîteya Hesinkeran de amedekarî dihête kirin. Hesinkerên Sûrê dê êdî karê xwe li wê derê berdewam bikin. Li Sûkê nêzîkê 300 hesinker hene. Hin dixwazin biçin û hin hesinker jî naxwazin bar bikin. Jiber kêmbûna zanyarîyê liser awayê barkirinê hin hesinker naxwazin bar bikin. Jiber ku bi awayekê berfreh zanyarî nehatiye dayîn. Herwiha jiber bûyerên Sûrê gelekî ketine tengasiyê û li sûkê wekî berê kar nakin. Bi sedema kêmbûna candarîya sûkê ji wan hinek dibêjin; heger ew biçin dê baştir bibe û biçin vê derê dikana xwe vekin. Herwiha jibo ew bikaribin dikana bikirrin, kredi jibo wan dihête dabîn kirin. Piştre dê her mehê 600 TL heqê dikanan li wan vegerînin.

Hoste Mehmet Yıldız û Sülükçü Mustafa derbarê rewşa karê xwe û barkirina sûkê de ji BasNûçeyê re axivîn.

'Ev bû 35 sal e ez karê hesinkerîyê dikim'

Hosteyê hesinker Mehmet Yıldız ji zarokatîya xwe ve li Sûka Hesinkeran a Sûrê dest bi kar kiriye û hîn jî li vê derê dixebite. Yıldız ji BasNewsê re behsa serborîya xwe kir. "Navê min Mehmet Yıldız e. 35 sal e ez vî karî dikim. Ez û birayê xwe bi hev re dixebitin. Xwedê rehmetê lê bike Dawud hoste hebû. Me li cem vî dest bi karê hesinê kir. Bi navê Mico hosteyê me yê hesinê hebû."

Di berdewamîya axaftina xwe da Yıldız serpêhatîyên xwe bi me re parve dike û dibêje: "Dema ku me dest bi vê xebatê kir, em zarok bûn. Me ji sibehê heta evarê av dikişand û me av ji Mizgefta Mezin dikişand û dianî. Herdu hosteyên me, hêdî hêdî em fêrî hesinkerîyê kirin."

Qezenca hesinkaran kêm bûye

Hosteyê Hesinkerîyê Yıldız balê dikşîne ser karê hesinkerîyê û dîroka sûkê û diyar dike ku Sûka hesinkeraan ji wexta Hz. Dawûd ve hatiye çê kirin. Hemû hesinên ku em çê dikin, bê wata nînin. Hemû ji şikleki hatine çê kirin. Bo mînak hesinê kelbetanan ligor şikleki kûçikan hatiye çê kirin û heta îro jî çêkirina wê wisa berdewam kiriye. Wekî ku hûn jî dibînin em jî ligor sedsalên berê çê dikin. Em li vê derê ji bo çandê çi alet hewce be, em çê dikin. Kolan, bivir, bêr hemû tişt tên çê kirin.

Ji aliyê din vê Yıldız sohbeta xwe tîne ser gotinên barkirina sûkê jî. Yıl-dız amaje dike ku bi awayekê resmî ji me re tişek nehatiye gotin; lê tê gotin ku Sûka Hesinên Sûrê wê bê girtin û emê li sîteya pîşesaziyê dikanan vekin. Herwiha wekî ku me bihistiye, ji bo vê amedekarîyek tê kirin. Em jî dixwazin ev dera bê girtin. Jiber ku li vê derê çet kar nabe. Em di rojekî de tiştekî difiroşin yan jî nafiroşin. Kar tuneye. Em hema tên û diçin. Dema ku kar tunebû, em jibo çi tên vê derê. Em vala diçin û tên.

Hoste Mehmet Yıldız di dawîya axaftina xwe de liser şerê xendekan ê Sûrê jî axivî û got: "Dema ku li Sûrê alozî derketin me zirareke mezin dît. Berî alozîyê rewşa me gelekî baş bû. Sûr nemaye. Sûr qedîyaye. Lê niha ti kar tuneye. Kes nayê tiştekî nakirre. Em jî dewletê alîkarîyê dixwazin. Ew jî zêde tiştekî nake. Dibêjin kredî didin. Lê jî bo kredîyê jî memur kefîl dixwazin. Ez ji ku derê kefîl bînim."

Serewedaritişê Bidlîsî yê 1914î û Mela Selîm

MUTLU CAN

Tarîx, şuûrê milî teşkîl keno yan zî bi vatişêko bîn bingeyê şuûrê milî yê yew miletî yo. Estena miletî ancax bi estena ziwan û tarîxî mumkun bena. Bêguman çiyo ke ferdanê yew miletî de hisê kokê (reya) ortaxî peyda keno û ey payîdar gêno tarîx o. Îbni Xaldûn, destpêkê mukaddîmeya xo de bale anceno muhîmîya kokî ser û vano ke "Şaro ke kokê xo çin o nêeşkeno dewlete rono"
Miletê ke yewîyê xoyê neteweyî teşkîl kerdê serkewte û muweffeq biyê. Heyf ke ma kurdî tena tarîx de ney ewro zî yewîye ra mehrum ê. Aye ra ganî ma kurdî xususen tarîxê xo baş bizanê. Eke ma tarîxê xo weş nêzanê, xeletiyê ke hetê partî, hereket û organîzasyonanê ma yê milîyan ra ameyê kerdêne, şaşîyê ke kal û bawanê ma kerdê nêzanê, normal o kema eynî xeletîyan tekrar bikerê. Çunke tarîx tena vizerî ra îbaret nîyo, o ameye ser o zî tesîr keno.
Wendoxê erjayeyî gama ke çekuyê tarîx û kurdî ênê têhet merdim beno huznin ney? Hela ke no merdim yew kurdperwer/e bo. Çunke şima zî zanê ke tarîx hîna zaf bedbextîya ma ano virê ma. Bedbextîya ke rengê xo tarîya şewe ra sîyayêr o. Çi tede çin o ke? Hetê nêyaran ra letebîyayîşê şar û welatê ma, jenosîd, qetliam, tewqîfkerdiş, surgin… Helbet şarê ma yê necîbî vera nînan çok ronênayo. Tarîxê kurdan hendayê nînan tarîxê serewedaritîşan o zî. Bêguman îcab keno ke ma hereket, lîder û şaxsîyetanê xo yê milîyan û serewedaritaşanê miletê xo zî baş bizanê.
Yew serewedaritiş esto ke kurdê ma derheqê ey de zaf zêde wayîrê melumatî nîyê No, Serewedartişê Bidlîsî yê1914î yan zî bi nameyê xo yê bînî Serewedartişê Mela Selîmê Gonigî (Mela Selîm, Şêx Şehabedîn û Seyîd Elî) yo. Ma wazenê nê nuşteyî de nê serewedartişî ser o vinderê

Serê seserra 20. de rewşa kurdan
Serrê verênî yê îqtîdarê Îtîhad û Teraqqîyî (Î. T.) hetê kurdan ra warê sîyasî û komelkî de averşîyişî îfade kenê. No termîn de sey Kürt Teavün ve Terakkî Cemiyeti, Kürt Neşr-i Maarif Cemiyeti, Hêvî rêxistinê sîyasî û kulturî yê kurdan ronîyaybîy û ancîya sey Şark ve Kürdistan, Kürdistan, Rojî Kurd rojnameyanê kurdan dest bi weşanê xo kerdbîy. La polîtîka nîjadperestîye çiqas ke aver şîye, nê rêxistin û weşanî hende zêde binê zextî de mendî û xora dima ra pêro ameyî girewtiş.
Zorê tirkan cepheya Trîpolî û Balkanî (1911-1912) şîbî û welat de rewşa ekonomîk û sosyale hîna zêde bîye xirab. Vera îdareyê Jon Tirkan reaksîyonê şaran zêdîya. Ser o zî Jon Tirkan dest eşt heqanê şaran. Naye ser o kişta mucadeleyanê ekonomik û sosyalan de mucadeleyê neteweyî zî dest pêkerdî.
Îstanbul de, netîceyê fealîyetanê rîsipîyan ê kurdan de, bi beşdarbîyayîşê temsîlkaranê heme grûbanê sîyasî û komelkîyan yê kurdan yew kombîyayîş ame kerdene. Nê kombîyayîş de qerar dîya ke yew partîya bihêz a ke do heq û menfietê şarê kurdî bipawo bêro organîze kerdene.

Rêxistina îrşadî
Raporê ke aşma tebaxe ya 1912î de hetê Sersefrîya Rûsya yê Tirkîya ra erşawîyabiy Wezaretê Karanê Teberî yê Rûsya, inan de bi nameyê Îrşadî behsê yew rêxistine biyêne. Nê raporan de vajîyayêne ke îdarekerê Îrşadî seba amadekarîya serewedaritişî herêmanê Rojhelatî yê welatî de, mîyanê kurdan de xebitîyenê. Goreyê melumatê ke Xeyretttîn Berazî daybî Konsolosê Rûsya yê Erzîromî Ştrîtterî, komîteya rêxistine nê kesan ra teşkîl biyêne: Sibkî Azîz Beg, Zirkî Akîd Efendî, Şêxê Zêtka [Eleşkirt] Usman Efendî, Selîm Efendî û Bekîr Efendî teşkîl kerdêne. Yew kasa û morê na rêxistine estbîy. Her endamê Îrşadî, sey aîdat aşme ra reye 10 lîra pere dayêne. Ganî ma xususen îzah bikê ke şexsîyetê ke serewedaritişî de Mela Selîmî ra dima rolê serekeyî kay kenê Şêx Şehabedîn û Seyîd Elî yê. Ma na rey zî muracatê îfadeyanê Konsolosê Rûsya yê Bidlîsî yê serra 1912î Şîrkovî bikîme. Konsolos Şîrkov yew raporê xo de wina vano: "Kurdanê Mintîqayê Bidlîs, Dîyarbekir, Mûsil û Wanî, semedo ke kurdan destê îdareyê tirkan ra raxelisnê û hukmatê xo îlan bikê dest bi amadekarîye kerde"

Ma Tayê Manzaraya Verê Serewedaritişî ra Behs bikê
Garo Sasunî vano: Verê serewedartişî Mela Selîm şino Mûş, Manastira Garabetî de, nê pêşnîyazan peşkêşê lîderanê Taşnakî Vartabed, Gorun û Rupenî keno:
1)No welat aîdê kurdan û armenîyan o.
2)Şert o ke no welat wayîrê heqê muhtarîyetêko hîra bo.
3)Ganî nê welatî, armenî û kurdî pîya îdarê bikê.

Serewedaritiş dest pêkeno
Aşma sibate ya 1914î de bacê heywankarî ke dewîjan ra ameyêne girewtiş zêdnîya. Anciya bacê tîcaretî %20 zêdnîya. Bedelê pul û xercan bîy dî qatî. Karmendan bi zor û zulmêko pîl bacî top kerdêne. Rewşa xirabe ya ekonomîk û sosyale ver êdî taqatê dewîjan nêmendbî. Osmanîyan 1913-1914î de bi paştgirîya Almanya amadekarîyekerdêne ke vera Rûsya şer bikê. Naye ra dewleta Osmanî seba ke eşkerî bikê venga camêrdanê kurdan dayênê û ê girewtêne artêşe. No muamele seba kurdan zehmetî bîye. Çunke înan debara xo bi karê zîreetî kerdêne û bi nê qerarî camerdanê xoyê ke nê karî bikerdêne ra mehrum mendêne.
Şarî, şertanê xiraban ver her ca de dest bi xoverdayîş kerdbî. Kurdanê Xoyutî,17 Sibate 1914 de Mudirê Nahîye Serdarzade Mehmet Efendîyo ke eynî wext de fermandarê cendirmeyan bî, eşt keyeyê ey ser, o û yew cendirme kişt î. Xora hukmat amadekarîya serewedaritişî ra xeberdar bî. Hukmatî, sibate ra tepîya dest bi tewqîfkerdişî kerdî. Qaymeqamê Hîzanî serê adare de 50 cendirmeyî wezîfedar kerdî ke wa Mela Selîmî bitepîşê û bîyarê. Cendirmeyan, eşt dewe ser û o tepîşt. Xebera tepîşîyayîşê Mela Selîmî her ca ra vila bîye. 700 kurdê çekinî kewtî cendirmeyan dima û vernîya înan dewa Arzivînkî de girewt. Bêke cîdî yew pêrodayîş bibo, Mela Selîm destê înan ra raxêlisnîya. Mela Selîm şî dewa Komaçî û xo uca de nimit. Seba ke mintîqa bipawîyo xendeq û çalî ameyî kenitîş. Ênо qebulkerdiş ke seredaritiş bi no hawa dest pêkerd. Demêko kilm de Tatîk, Hîzan û sewbîna cayan de îdare kewt destê kurdan. Kurdan nê cayan de dest ronayêne çekanê leşkeranê tirkan ser.
Pêrodayîş, Bidlîs de 20 adare 1914 de dest pêkerd. Panc hezar kurdê silehinî kewtîy bajar û bajar 12 nîsane de ame girewtiş. Kurdî herçiqas verê cû serkewte bîy zî seba ke hereketê înan baş nêameybî rêxistin kerdene nêeşkay serewedaritişî bi hawayo nîzamî biramnê. Heto bîn ra tayê eşîrî daxilê hereketî nêbîy tayê înan zî wexto krîtîk de hetê tirkan de ca girewt. Netîce de zorê kurdan şî. Mela Selîm, Şêx Şehabedîn û Seyîd Elîyî, çend kesê bînî sey tedbîr xo eştî bextê Konsolosxaneyê Rûsya yê Bidlîsî. Destpêkerdişê Şerê Dinya yê Yewinî ra dima tirkan eşt konsolosxanê ser. Mela Selîm û kurdê bînî têpîştî û darde kerdî.

Xususîyetê nê serewedaritişî çi yê?
Ma bi kilmîye ancax eşkene wina vajê: Verê ronîyayîşê Komara Tirkîya û demo peyên yê Osmanîyan de sey hereketê Şêx Ubeydullah, Koçgîrî û çend hereketê kurdan estê ke herçiqas manaya moderne de nêbo zî sey rêxistinê milî yê kurdan hesîbîyenê. Hereketê Mela Selîmî zî nînan ra yew o. Bê naye seke ma zanê tarîx de hereket û lîderê ke semedê raxelisnayîşê kurdan hetkarîya armenîyan wazenê û înan reyde diplomasî kenê zaf tay ê. Yewna xususîyêtê nê hereketî zî no yo. Çend şexsîyetê zazayî ke ma zanê lîderîya serewedaritişanê seserra 20. ê kurdan kerda, yewê înan zî Mela Selîm o.
Noto peyên: Kesê ke wazenê Mela Selîm û nê serewedaritişî de hîna bidetay melumat bigîrê, înan rê pêşnîyaza ma no yo ke xususen eserê Celîlê Celîlî ke çismê çimeyan de vîyarenê, înan biwanê.

Mela Selîm (Mela Selîmê Gonigî/Dimilî) kam o?

Mela Selîm,yew zaza yo.1850 de Şîn de maya xo ra beno. Na dewe Çewlîg de ca gêna û girêdayeyê qezaya Dara Hênî ya. Dewleta Tirkan, nameyê aye "Balgöze" nayo pa. Keye dima ra şino dewa Azîzanî ya Kanîreşî de ca beno. (Azîzan, mintîqaya Gonigî de ya û mintîqa zî nameyê xo çemê Gonigî ra gêno) Mela Selîm, perwerdeyê dînî yê verênî pîyê xo ra gêno. Peyê cû mintîqayanê cîya-cîyayan yê Kurdistanî ra gêrêno û medresayanê înan de waneno. Dima Misir de Unîversîteya El-Ezherî qedeneno û îcazet gêno. Dima agêreno dewa Qalencikî ke nêzdîyê dewa ey de ya, uca ca beno. Uca yew medresa roneno. Wexto kilm de beno namdar. Şîno bajarê pîroz yê Îranî Qum û uca 4 serrî medresayan de mudersîye keno. Lehçeya zazakî ra teber kurmanckî, fariskî, erebkî û osmanî zaneno. Mela Selîm tena merdimêkê dîndar û welatperwer nêbî eynî wext de yew şaîr û edîb bî. Ey, Mesnewîyê Buxarî bi kurdkîya kurmanckî şerh û tefsîr kerdo.
Law Reşîd, derheqê Mela Selîmî de nê melumatî dano: Mela Selîm zazayanê derûdorê Dara Hênî ra û kesêko ke emrê xo dorê 55-60 serran bî. Îlmanê dînî û erebkî zanayêne, kesêko zanaye û dîndar bî. Eke merdim rolo ke ey kay kerdo ra biewnîyo şêno ey sey "simayê kê seba şexsê xo xoser ê" înan ra yew bihesibno. Winî fehm beno ke îdealist o û îradeyê xo xurt o. Derheqê ey de yewna melumato muhîm hetê Hesen Hişyarî ra dîyêno. Hişyar, gama ke derheqê Kurdistan Azm-i Kavî Cemîyetî de agahî dano, ronayoxanê nê teşkîlatî mîyan de nameyê ey zî vano. Ma bi no qayde musenê ke Mela Selîm, 3 zazayê ke ronayoxanê na cemîyete mîyan de ca gênê, yewê înan o.

Çimeyê ke Ci ra Ame Îstîfade Kerdene Nê yê:
Celîl, Celîle, Kürt Aydınlanması, Avesta Yayınları, İstanbul, İstanbul, 2013
Celîl, Celîle, Kürt Tarihinden 13 İlginç Yaprak (Çeviren: Hasan Kaya), Evrensel Basım Yayım, İstanbul, Birinci Basım, Kasım 2013 r. 114-139
Celîlê, Celîl, "1914 Bitlis Kürt Ayaklanması", Berhem:Kovara Lêkolînên Civakî û Çandî, Hejmar: 9 (1990), Stockholm
Malmîsanij, Yüzyılızın Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet, Jîna Nû Yayınları, Uppsala, Mayıs 1986, r. 61-62
Malmîsanij, Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbekir'de Kürt Uluşculuğu (1900-1920), Vate Yayınları, İstanbul, 2010, r. 16-20
Bingöl, Nevzat, Bitlis İsyanı ve Şeyh Selim, Do Yayınları, İstanbul, Mayıs 2013
Koç, Ali Haydar, "Bitlis Kürt Milli Hareketi (1914) 2, Dema Nû: Haftalık Siyasi ve Kültürel Gazete, Hejmar: 167 (22 Ağustos 2016), İstanbul
http://www.bitlisname.com/2015/11/19/portreyek-ji-diroka-me-mela-selim-efendi/(çimeyo digital)

Raywanêkê edebîyatî: Abdullah Çelîk

Yew edîb, romannuştox, şaîr la verê her çî yew merdimo amedîj. Hikayeya A. Çelîkî manena hîkayeya cografyaya xo; dej, gèrayîş, hêvî, tenayî û raywanîya nênase. Qelema ey hem bi tirkî nusena hem zî bi zazakî. Demo nêzdî de yew romanê ey o tirkî weşanxaneyê Everestî ra vejîya. Ma rojêka Dîyarbekirî ya germine de amey têhet û huner, edebîyat û helbet hîkayeya ey ser o qisey kerd.

Ma fekê to ra bişinasnîme Abdullah Çelîk kam o?
Ez 1977 de qezaya Dîyarbekirî Pasûr de ameya dinya. Mi zanîngeh de beşe bîyolojî wend. Heta 20 serrîya xo ez Dêrsim de menda. Mi uca de dest bi mektebî kerd û heta lise uca de qedena. Dima şîya universîte. Nika nêweşxane de xebitîyêna, ez memur a. La o kare min o, çîyo ke weş bi şino ez edebîyatî ser o xebitîyena. Hem bi zazakî hem zî tirkî nusena. Heta nika 3 kitabê mi vejîyayî. Nameyê kitabe mino verên "Bıçak Sırtında" yo. Tarîxê sendîkaya SESî de ser o bî. Dima mi kitabêkê şîîran nuşt; "Büyük Geçit". Ey ra dima 3 aşmî verê cû hebêk romanê mi vejîya; İleride Hep Yalnız.

Eleqeyê to bi edebîyatî senî dest pêkerd, tî eşkenî tayê behs bikî?
Ti zî zanî ma verî bi ziwanê xo çi nêdîyo, nênuşto. Destpêkê ma tirkî ya. 1993î ra nata ez wanena. Yanî ez bi xo wendêkarêko baş a. Mi destpêk de hîkayeyî wendî; yê Omer Seyfettinî, Kemalettin Tugcu.. Wextê mino mektebe mîyanên bî. Wendene weşe bi mi şîyêne. Kitabê Yaşar Kemalî mi wendî. La mi o wext bi tirkî wendêne û bi tirkî nuştêne. Dima 1996 de ez şîya universîte. Uca de wendişê mi bi hawayo sistematik dewam kerd. Edebîyat, teorî, sosyolojî, psîkolojî.. mi hemîne ser o epey kitabî bi wendî. O wext ra heta nika zereyê mi de nuştiş bibî. Mi vatêne gereke ez rojêk bînusî. La mi hetanî 4-5 serrî vere cû bi ziwanê xo nêwendbî. Hayê ma ziwanê ma ra çin bî. Temam, ma bi ziwanê xo qalî kerdêne, bawanê xo, pîlanê xo reyde bi ziwanê xo qisey kerdêne la ma bi ziwanê xo nênuştêne. Aye ra ez tirkî ser o xebitîya. Derdê mi o bî ke ez rojêk hîkaye, roman binusî la bi ziwanê xo ney. Çunke ziwan, ziwanê ma nêbî, ma, nêeşkayêne xo sey ziwanê xo, xo rehet îfade bikê. Zereyê ma de çiyêko pîl bî; mi vatêne ez ganî nê ziwanî baş bişuxulnê ke wa nêvajê, nê ma ra nîyê. Bi ma yariye [heneke] nêkerê.

Goreyê to nuştiş yan zî edebiyat çi îfade keno?
Çiyo ke binusîyo maneno. Edebîyat mi gorê çiyêko sey arşîv o, yanî belge yo. Tayê kesî estê mavajî waştişname, rojname, kovarî felan ûêb… vanê qey arşîv tena bi nînan yeno viraştiş. La o nîyo yanî. Mesela mezgê mileti bi edebîyatî beno berz. O het ra mi gore yew şar edebîyat çiqas bişuxulno, edebîyat de aver şiro mezgê ê şarî hende beno hîra, ziwan û kulturê ê şarî înan aver şino.

Yanî ti vanî ke edebîyat eslê ci de awankerdişê arşîv û mezgê komelî yo, raşt o?
Raşt o, eynî winî yo. Baş o. Gelo yew nuştox senî nuseno? Mesela ti bi xo eşkenî tayê melumat bidî; ti senî nusenî, atmosferê nuştişê to senîn o? Mi gore nuştiş raywanî ya. Hîkayeya nuştişî hîkayeya raywanî ya. Nuştox gama ke dest bi nuştiş keno, keweno rayîr. Ti mi ra bipersî ke no rayîr çiqas dûrî yo? Ez nêzena çiqas dûrî yo. Roman de na raywanî senîn a ti zanî? Gama ke nuştox keweno rayîr, rayîr ra çi bivîno ey nuseno. Merdim verê ke bikewo rayîr wayîrê zanayîşê rayîrî nîyo. Ganî bikewo rayîr, bivîno û çi dîyo ganî ey binuso. Hetê mekanî ra zî ez eşkena wina vajî; ez her şewe 9-9:30 de rakewena, şewe saete 2 yan 3 de werzena heta serê sibayî xebitîyêna. Benvengîye hîna baş a. Atmosferê merdimî baş bo atmosferê metnî zî baş beno. Merdim çiqas tena bi sereyê xo bimano hende metne başî vejîyenê meydan.

Goreyê to krîterê eserê baş û xirabî çi yo yan zî çi yê?
Ez çîyêk vajî; seke ma dest bi dibistanî kerdbî, kes çin bî deste ma bigîro, çîyêk bimusno ma. Yanî ma xo bi xo musayî. Mamostayê ma ziwanêko bîn şuxulnayêne, ziwanê ma ziwanêko bîn bî. Mi zî gama ke dest bi wendişê kitaban kerd, mi o wext nêzanayêne kamcîn kitab baş o kamcîn xirab o. Ez raşta ci vajî, kitabê ke mi verê cû wendê zafê înan pîs bîyî. La hetê edebî ra çîyo ke mi nêbaşîye ra fehm kerdo qasê ê başan nîyo. Min ewilî kitabê ke hetê edebîyatî ra baş nîyê, zeîf ê, mi ê wendî. Nika ez krîterê kitabanê başan û xiraban çi yê, ez zana.

Baş o, ez wazena to fikre to weş fehm bikî. Yanî yew eser goreyê çîyî baş yan zî xirab o?
Ganî hetê ziwanî ra sewîyeyêka tewr berze de bo. Yanî ganî hunermend ziwanî zaf baş bişuxulno. Eser hetê ziwanî ra ganî zelal bibo, şerto yewin yê kitabî/esere başî no yo. O dîyin ganî mûnite [kurgu] zaf baş bibo. Edebîyat çîyan newe ra virazeno yanî fealîyetê viraştişî yo. Çîyo ke mezgê hunermendî/e de bêro viraştiş, ganî hetê ziwanî ra, hetê mûniteyî ra çîyêko baş bibo. Û eke nê her dîyinî baş bibê, xora ê bînî bi xo yenê meydan.

Seke yew înşaat berz bibo yanî …
Berz bo, eke binge sexlam bo, problem çin o. Bingeyê [temele] yan edebîyatê dinya de mi rê ferq nêkeno. Krîterê mi oyo ke mi rê mamosta bibo, mi tatmin bikero û aver bêro.
Romanê to yo tewr verên "İlerde Hep Yalnız" biba. Kitabê to, demo nêzdî de vejîya , reyna bixeyr bo. Keremê xo rê tayê ey ra behs bikê?
Zaf sipas. To va verên la verên nîyo. Verê ey zî yew romanê mi esto la mi o çap nêkerd. Çîyêko xirab ame sereyê mi ser. Gama ke mi o roman nuşt mi şawit embazêkê xo rê. Ma ke çîyê ke nuştêne fikrê yewbînan pers kerdêne. Ey nêmeyî ra zêdêr kitabê mi kerd malê xo û kitabê xo de neşr kerd. Wexto ke kitabê ey weşanîya mi ci ra ewnîya ke %80î ra zêdêr muhteweya kitabê min o. Tabî zaf zorê mi şî. Mi va ganî ez yewna kitab binusî ke xo îspat bikerî. Çunke mi kamî ra vatêne, bi şubhe ewnîyayêne mi ra. Gelo "Ecêb çîyo winasî esto yan çin o? Bekî zurî keno" Welxasil naye ser o mi mabênê aşmêk de îskeletê romanî nuşt. Heta 1.5-2 serrî ez kitabî ser o xebitîya. Mi verê cû va ya yew cumle vîda ya. Yanî mi cumle bi cumle, hetê mana ra, hetê mûniteyî ra hetê estetîkî ra ez ser o xebitîya û roman vejîya meydan. Ez bawer kena senî ke kitab vejîya êyê ke mi ci ra vatbî kitabê mi diznayo berdo, înan bawer kerd ke no roman nuseno.

Derheqê romanê xo de to senî reaksîyonî girewtî? Weşanîyayîşê ey ra dima çend çîyê xirabî qewimîyayî…
Kitabê mi senî ke vejîya, ci rê reklamî virazîyayî. La tehtîlê roşanî ame. 9 rojî bî tehtîl, kitab nêame vilakerdiş. Dima tam derheqê kitabî de rojname, kovar û televîzyonan de reklamî dîyayî, na rey teşebusê derbe bî. Tam televîzyonan ra teklîf ame ke ma reyde roportaj bikerê, na rey zî televîzyonî padîyayî. Nê pêro dezavantajê îstîsnayî bîyî.

Qey "İleri de Hep Yalnız", çira Pasûr û 4 qehramanê alaladeyî ?
Ê mi karakter nîyê, tîp ê. Çunke mîyanê heyatî de vîndî bîyê. Bi xo zî nêvînenê, hende xo ra zî kewtê dûrî. Nika halê dinya yo. Yanî Pasûr nêbo Brezîlya de koyêk bo zî eynî yo, derdê înan wexto tewr kilm de zengîn bîyîş o. Raya kilmî ra zengîn bîyayene kapîtalîzm nîşane ma dano ney? Kapîtalîzm nêvano ti çiqas bixebitîyî hende bibê zengîn. Bi tirkî vanê "köşeyi dön de nasıl dönersen dön" Fikrê tîpanê romanê mi no yo. Çirê Ileri de Hep Yalnız? Amokachî 93-94 de kulubê Beşiktaşî de tope kay kerdêne, futbolbaz bî yanî. Ti zanî kitab de ge-ge behsê futbolî vîyareno. Nika ti vajî çi eleqeyê futbol û romanî esto? Goreyê mi heyat û futbol yewbînan ra dûrî nîyê. Ganî heyat de her merdim golêk bierzo.
Baş o, ez wazena derbazê zazakî biba. Gelo to senî hawa dest bi nuştişê ziwanê xo yê dayîke kerd? To eynî wext de Unîversîteya Artukluyî lehçeya kirmanckî ser o perwerdeyê masterî dî? Çarçewaya pêroyî de ma qalê nê hetê to bikimê.
Ma verê cû ma zazakî zaf nêzanayêne. Hetê qalkerdişî ra problem çin o. Êyê ke dorûverê ma der ê ma înan reyde bi zazakî qisey kenê. Ma, ge-ge xo mîyan de vatêne "Gani ma bi ziwanê xo binusê" Gama mi ke şîîrî nuştêne embazê ma yo pîranij estbî vatêne "ti ganî bi zazakî binusî" yanî to de cewher esto ganî ti bi ziwanê xo bişuxulnî. Tabî mi nêzanayêne, mi hende ke bi tirkî nuştbî û wendbî ke mi vatêne zor o, ez nêeşkena binusî. Ê wextan Unîversîteya Artukluyî de kirmanckî ser programê bêtez û bitezî yê masterî abîbî. O wext mi va hela biceribnî, biewnî şansê xo ra. Ez kewta îmtîhan mi qezenc nêkerd reya verêne. Dima ez xebitîya mi va ganî ez şêrî yanî ser o vinderî. Serrêk xebitîya, mi wend, nuşt. Mi tayê xo aver berd û dî ke çîyêko hende zî zor nîyo. Merdim bixebitîyo, tayê sereyê xo bidejno eşkeno bimuso, xo aver bêro. Dima ez kewta îmtîhan, mi qezenc kerd. Mi uca de serrêk wend. Û dima zazakî ser o vinderta. Dima mi kovara Wejê û Rexne rê, derheqê nuşteyanê zazakî de şewirmendîye kerde. Ez Kovara Zarema de zî berpirsîyarê beşê zazakî bîya. Na mana de raywanîya mi hema dewam kena.

Gul Mihemed sembola berxwedanê



"Xorasanê gelê kurd zêde dîtiye". Romana Kilîderê bi vê hevokê dest pê dibe. Dirêjtirîn romana farsî ku di 10 cildan de hatîye nivîsîn. Kilîder qala jîyana eşîreteka kurd dike ku demekê bi hikûmeta Pehlewî re şer kirin. Kilîder berhema Mehmûd Doletabadî, nivîskarê hevçerx e ku di 3000 rûpelan de hatîye çap kirin. Roman vegêrrana jîyana malbateka kurd li Xorasanê ye. Destana Kilîderê piştî şerê duyem yê cihanê di navbera salên 1946-1948 de qewimîye. Lehengê romana Kilîderê Gul Mihemedê Kelmîşî ye. Gul Mihemed li hemberî dewleta Pehlewî ser hildihîne. Tevî eşîreta xwe li hemberî dewleta Pehlewî şer dike. Doletabadî jîyana wan û aşop li hev hûnane û dirêjtirîn romana farsî afirandîye ku di edebîyata Îranê da gelekî binavûdeng e. Kilîder wekî Înce Mihemedê Yaşar Kemal e ku çîroka jîyana kurdan vedigêrre. Doletabadî piştî têkçûna Partîya Komunîst a Îranê (Tûdê) û binketina wê tevgerê, jîyana Gul Mihemed ji bo şirovekirina rewşa sîyasî ya piştî şkesta partîya Tûdê nivîsî. Serpêhatîya Gul Mihemedê Kelmîşî bûye vegêrrana rewşa sîyasî ya Îrana piştî şerê duyem yê cihanê. Mamoste Tewehudî ku bi xwe ji kurdên Xorasanê ye, piştî çend salan belgeyên dîrokî kom dike û bi kesayetên beşdar di bûyera Kilîderê re diaxive. Tewehudî kitêbek bi navê Kilîder der Esnad û Vaqîyat çap kirîye ku wekî jîyannameya rastîn ya Gul Mihemedê Kelmîşî niha li ber destên me ye.

Bûyera Kilîder

Riza Şahê Pehlewî, sala 1934ê serdana Tirkiyê dike; li wir dibîne ku Ataturk hin reform pêk anîne. Ataturk dixwast Tirkîyeyeka modern ava bike. Riza Şah dema vedigere Îranê hin qanûnên nû jibo modernkirina Îranê pêşnîyaz dike. Yek ji wan qanûnan jî cihwarkirina koçeran bû. Dema ku ew qanûn derket, eskerên dewletê li her derê ku koçer bidîtana, konê wan dişewitandin. Yan jî bi rişwetê çavê xwe digirtin û ji koçeran dûr dibûn. Piranîya kurdên Xorasanê mijûlî pezdarî û cotkarîyê bûn. Ji ber siruşta germ û hişk ya Xorasanê hejmareka zêde ji kurdên wê herêmê mecbûrî koçerîyê bûn. Ji lewre dema qanûna cihwarkirina koçeran derket, herî zêde kurdên Xorasanê ketin ber pêla hêrişên dewleta Pehlewî.

Ji ber qedexekirina koçerîyê, rewşa kurdan hêdî hêdî xerabtir dibe; li herêmên wekî Sebzewarê ku hejmara kurdan kêmtir bûye, esker bi hêsanî cihê koçeran peyda dikin û ji wan re dibin asteng û rê li ber jîyana wan ya koçertîyê digirin. Gul Mihemedê Kelmîşî lipey çareserîyekê digerîya ku çend esker dihên nava konan û bi bihaneya pêşîlêgirtina jîyana koçertîyê, nîyeta xwe xerab dikin û çav berdidin jin û keçên kurdan. Dema dîya Gul Mihemed dibîne ku esker naxwazin dest ji wan berdin, ji Gul Mihemed re xeberê dişîne û çîroka eskeran digihîne guhê wî. Gul Mihemed, bira û apê wî vedigerin nava konan û li wê derê çend eskeran dikujin û wan dişewitînin. Bi vî rengî şerek di navbera eşîreta Kelmîşîyan û dewletê de diqewime ku çend salan dewam dike. Êdî Gul Mihemed çeka xwe danayîne erdê. Li her derê ku kesekî mezlûm û bindest hebe, ew diçe alîkarîyê dike. Gul Mihemed gelek axa û feodalên herêma Xorasanê agahdar dike ku dest ji zilm û kedxwarîyê berdin û êdî zilmê nekin. Êdî Gul Mihemed dibe sembolekê ku hemberî zilm û zora dewlet, axa û feodalên herêma Xorasanê radiweste. Li alîyê din axa û feodal hertim şikayeta wî dikin. Alîkarîya dewletê dikin ku bikaribin dawî li tevgera Gul Mihemed bihînin. Gul Mihemed derdikeve çîyayên Kilîderê; hejmara peyayên wî hêdî hêdî zêde dibe. Çendîn caran dewlet bi awayên curbicur dixwaze Gul Mihemed bixapîne lê hercar Gul Mihemed ji destê wan direve û tevgera xwe xurttir dike.

Dema ku xebera serhildana Kelmîşîyan digihîje Şahê Îranê, ew destûra girtin û kuştina Gul Mihemedî dide. Artêşa mezin ya Xorasanê ji Meşhedê diçe Sebzewarê. Çîyayên Kilîderê ji çend alîyan ve dihê dorpêçkirin. Gul Mihemed û hevalên wî pê dihesên ku rojeka dijwar li pêşîya wan e. Dema ku roj li avabûnê ye, dengê tifingan bilind dibe. Şerekê neyeksan dest pê dibe, gulle û fîşek ji her çar alîyên çîyayê Kilîderê li wan dihên baradin. Dengê silehên giran bêdengîya çîyayên herêmê dişikênê. Heta derengîya şevê li ber xwe didin. Birayê wî yê biçûk di tarîtîya şevê da direve û yên din hemû yan birîndar dibin yan jî canê xwe ji dest didin. Dema ku esker digihêjin ser cenazeyan, Gul Mihemed hîn zindî ye; wî û hevalên wî li hespan bar dikin û ber bi bajarê Sebzewarê bi rê dikevin. Di rê de Gul Mihemed canê xwe ji dest dide. Termên çar kesan, Gul Mihemed, Xan Emû (Apê Gul Mihemed) Elîcan û Beg Mihemed heta çend rojan di nava bajarê Sebzewarê de digerînin û bêhurmetî li cenazeyên wan dikin.

Li ser wê bûyerê gelek stran û helbest hatine gotin ku hîn jî li Sebzewarê ev stran li ser zimanê xelkê digere. Strana Gul Mihemed hertim ji bo xelkê Sebzewarê bîranîna bûyera Kilîderê zindî dike.

Şeva bûyerê, birayê Gul Mihemed yê biçûk, Xan Mihemed dema ku bêçare dimîne û êdî dizane hemû hatine kuştin, bi destûra Gul Mihemedê birîndar, ji meydana şerî direve û esker nikarin wî peyda bikin. Piştî demekê direve derbasî Iraqê dibe. Bavê Gul Mihemed, gelekî hewl dide ku kurê xwe razî bike heta ew xwe teslîmî dewletê bike. Xan Mihemed di serî da razî nabe, lê bavê kelmîşîyan diçe Tehranê, Şahê Îranê dibîne û çîroka kurên xwe ji wî re dibêje. Dema şah lê guhdarî dike, nameyekê dide bavê Gul Mihemed û dibêje vê nameyê bibe bigihîne destê fermandarê leşkera Xorasanê. Ew jî wisa dike û bi vî rengî Xan Mihemed vedigere û li gundê Zeferanê niştecih dibe. Lê wisa ku Tewehudî jî dibêje, Xan Mihemed piştî demekê li gor planên xwe dest bi telafîkirinê dike. Gelek kesên ku di kuştina Gul Mihemedî da alîkarîya artêşê kiribûn, dikevin nava plana wî. Xan Mihemed piştî demekê dev ji jîyana xwe ya normal berdide û hemû kesên gumanbar di bûyera Kilîderê de dikuje.

Çîroka Kelmîşîyan dûr û dirêj e.

Gul Mihemed di nava kurdên Xorasanê de bûye sembola berxwedanê. Kurdên Xorasanê, wî bi navê Xanê Kelmîşî dinasin. Stran û lorîkên Xorasanê cihekî taybet dane bûyera Kilîderê. Ev stran hertim di guhê zarokên kurd de wekî lorîka dayîkan dubare dibe. Û kurd hertim li benda Gul Mihehemedên xwe ne.

Xanê Kelmîşî Xan cano
Fikra me bikşîn, Xan cano
Xan cano, eger fikrê me nekşînî Xan cano
Lê hatîye ser me qoşîn…

Xelata Berûya Zêrîn

AGIRÎ ISMAÎL NIJAD

Kelîmullahê Tewehudî, dîroknigar û lêkolînerê mezin yê kurd dema ku pêncemîn xelata Berûya Zêrîn pêşkêşî Yelda Ebbasî dikir, got: "Yelda; wezîfeya te pir giran dibe, ev xelata xelkê Kurdistanê û xelkê hunerdost yê Merîwanê ye ku ez pêşkêşî te dikim; divê tu barê giran yê muzîkê bigirî ser stûya xwe."

Yelda Ebbasî, dengbêj û dutarjena kurd, kêmtementirîn jina kurd e ku heta niha xelata Berûya Zêrîn wergirtîye.

Yekemîn xelata Berûya Zêrîn, sala 2012ê pêşkêşî hunermendê dengbêj, Osman Hewramî hate kirin. Hewramî Sîyaçemanebêj û Horeçîrê kurd, niştecihê bajarê Nodşeyê li Rojhilatê Kurdistanê ye.

Duyemîn xelata Berûya Zêrîn, sala 2013ê bo Celal Melikşah şair û nivîskarê kurd hate pêşkêşkirin û sêyemîn xelata Berûya Zêrîn sala 2014ê li hunermedê peykertiraş, Hadî Ziyaudînî hate pêşkêşkirin, herdu hunermendên ku xelata duyem û sêyem wegirtin xelkê Sineyê ne. Bi vî rengî Sine yekem bajarê Kurdistanê ye ku heta niha du xelatên Berûya Zêrîn wergirtine.

Çaremîn xelata Berûya Zêrîn sala 2015ê pêşkêşî Elîdost Felahetî hat kirin. Felahetî hunermendê dûzelejen yê kurd e. Li Îlamê ji dayîk bûye û ew salmendtirîn kesayet e ku heta niha ev xelat wergirtiye. Elîdost 60 sal ji temenê xwe bo parastin û ragirtina hunera dûzelejenîyê terxan kirîye.

Yelda Ebbasî li bajarê Şîrwanê li bakurê Xorasanê ji dayîk bûye û kurda Xorasanê ye. Ew mamosteya meqmên folklorîk yên kurdî li bakurê Xorasanê ye.

Yelda Ebbasî şeva 21ê Desambra 2016ê pêncemîn xelata Berûya Zêrîn wergirt.

Berû di kultura kurdî de, wekî sembola xweragirîyê dihête naskirin û xelata Berûya Zêrîn bi wan kesan dihête dayîn ku tevî parastina kultur û hunera kurdî demekê xweragirî kiribin.

Navenda kultura Vejîn ku komeleyeka kulturî ya xelkê ye ji alîyê çendîn çalakên kulturî yên kurd li Merîwanê bi rê va diçe. Salane di şeva çileyê da (şeva Yeldayê) 21ê Desambrê bo rêzgirtin li kesayetên kurd ku temenê xwe bo parastina çand û hunera kurdî terxan kirine, ev xelat li wan dihê pêşkêş kirin.

Dema birêveçûna rêûresma xelata Berûya Zêrîn, xelkê Merîwanê di heman demê da cejna şeva çileyê jî pîroz dikin, û loma salane cejna şeva çileya Merîwanê û rêûresma pêşkêşkirina xelata Berûya Zêrîn bi hev re bi rê ve diçin. Di merasimê de çendîn şairên mêvan ku heryek ji wan ji bajarekê Kurdistanê hatine dewet kirin, çend helbestên xwe pêşkêş dikin, û piştre kurtefîlmek li ser jîyana kesayetê/a ku biryar e xelat lê bihête pêşkêş kirin, dihête belav kirin û di dawîyê de xelata berûya zêrîn pêşkêşî wî/wê kesayetê/a dihêtê kirin.

Cejna şeva çileyê, cejneka kevn ya Kurdistanê ye û li gor bawerîya mîtrayîsmê li wê şevê ku dirêjtirîn şeva salê ye, yezdê (xwedayê) ronahîyê (Yelda) ji dayîk dibe û mîtra wisa bawer in ku divê li wê şevê ti kes ranekeve û heta sibehê xelk mêvandarîyê bike. Çerez û mêweyan bixwin ji ber ku rizq û rûzîya wan zide bibe. Dema rêûresma xelata Berûya Zêrîn, tenê bi hinaran pêşwazî li mêvanan dihête kirin. Li gor nerîta kevn ya Kurdistanê di şeva Yeldayê de, tenê bi hinar, mewîj, gwîz û behîvan pêşwazîya mêvanan dihat kirin. Lê Navenda Vejînê tenê bi hinaran pêşwazîya mêvanên xwe dike.

Nameyeka Dîrokî ji H. G. Wells Bo James Joyce

Çar sal berê Letters Of Noteê di hejmara xwe ya Çiriya Paşîn de du nameyên balkêş weşandin. Herdu name jî, di dawiya salên 1920î de, ji James Joyce re hatibûn şandin. Wê demê J. Joyce li ser pirtûkekê dixebitî û hin beşên vê pirtûkê, ku wekî "berhemeka li ber nivîsandinê" di hin kovaran de belav dibûn, li derdorên edebî dihatin xwendin. Deh sal bi şûn de ev xebat bi navê Finnegans Wake derdikeve û, li gorî gelekan, di zimanê îngilîzî de dibe pirtûka herî zor a aşopî.

Nameya pêşîn ji alîyê nivîskarekî zîrek, afrîner û piralî bi navê H. G. Wells ve hatibû nivîsîn. Wellsê, ku çar caran dê ji bo xelata Nobelê wekî namzed bihata nîşan dan, wê demê birrek pirtûkên aşopa-zanistî (science-fiction) nivîsîbûn û di vî cûreyî de bûbû nivîskarê herî mezin ê edebiyata îngilîzî.

Nameya duyemîn, yekî bi navê Vladimir Dixon nivîsîbû. Piştî çendîn salan gelek kesan, tenanet weşangera Joyce, Sylvia Beacha, dê wisa bawer bikira ku kesayetê nepen ê ku nameya xwe bi şêwaza Finnegans Wakeê nivîsîbû Joyce bixwe ye.

Hem H.G. Wells, hem jî V. Dixon, piştî ku wan beşên Finnegans Wakeê dixwînin, ji Joyce re namena dinivîsin. Nameya Wells bi hizrên li ser paşeroj û paşxana nivîskar, têkilî û karîgeriya wê li ser cîhana nivîskar a afirandinê û peydabûna şêwaza wî mînakeka pir balkêş radixe ber çavan. Gotinên ku Wells bi kar dihîne dema xwe û J. Joyce berawird dike; wêrekîya ku pê nirxandina xwe ya qet'î û rasterast radigihîne hejayî xwandinê ye. Lewma me xwast vê nameya ku yek ji nameyên herî xweş ên tarîxa edebiyatê ye wergerînin kurdî û bi we re parve bikin.

"23yê Çiriya Paşîn, 1928
Joyceê delal:

Ez gelekî li ser te sekinîm û derbarê te de fikirîm. Netîce ew e ku ez nikarim tiştekî bo propagandaya berhema te bikim. Ez pir ji kitêbên te yên pêşî û dehaya (bilîmetiya) te re rêzê digirim; êdî wekî şexs gelekî kêfa min jî ji te re dihê lêbelê cihoka min û te bi temamî ji hev cihê ye. Te perwerdeyeka katolîk, îrlandî, serhildêr wergirtiye; lê herçî a min e, zanistî, avaker (konstruktif) û, bi qeneeta min, îngilîzî ye. Fehm û feraseta min cîhanek e ku têde pêvajoyeka yekgirtî û civandî mimkun e (zêdebûna hêzê û curbicuriyê bi saya aboriyê û komkirina hewldanê), pêşketineka ku ne bivênevê ye lê balkêş û mimkun e. Vê lîstikê ez cezb kirim û min bernade. Ji bo wê, zimanek û vegêrraneka ku heta jê tê sade û zelal ji min re lazim e. Tu katolîk rabûyî yanî bi sîstemeka nirxan a ku bi temamî lidij rasteqînîyê ye. Hişmendîya te bi sîstemeka kafirstanî a nakokiyan duçar bûye. Dibe ku tu ji bakirîyê, ji safîtîyê û xwedayekî tak bawer dikî û lewma hertim dibe qareqara te yî gû û gayînê û cehnimê. Ji ber ku ji bilî nirxên takekesî bawerîya min bi van tiştan naye, ez qet nabehitim ji van qêrînên li hember daşiran û cilikên serê mehê –û bextreşiyên neheq. Ê te tu di bin nîrê xapînokîya bindestîya siyasî de, ê min ez di bin nîrê xapînokîya berpirsiyarîya siyasî de mezin bûm. Ji bo te tiştekê xweş e ku tu li ber rabî û dev jê berdî. Lê ji bo min ne bi qasî serê derziyê.

Vêca ku em werin ser vê azmûna te ya wêjeyî. Tiştekê hejayî ramanê ye, çinku tu mirovekê heja yî û di xulqê te yê qelebalix de dehayeka mezin heye ji bo derbirînê ku ji ber disiplînê filitiye. Lê ez bawer nakim ku ev tiştekî bi ser tiştekî bixe. Te pişta xwe daye mirovên 'am (ji rêzê) –pêdivîyên wan ên seretayî, û dem û zîrekiya wan a bisînor, û te hûr û dûr ajotiye. Netîce? Xaçepirsên bê serî û bê dawî. Herdu kitêbên te yên dawî, nivîsandina wan bi kêf û bi heyecan bûn lê xwandina wan ê tucarî ewqas bi kêf û bi heyecan nebe. Hesêbî ez xwandevanekî 'adî me. Ez zewqê ji berhema te distînim? Na. Ez his dikim ku ez tiştekê nû û ronîker werdigirim mîna dema ez wergera berbad a Anrep a kitêba xerab a Pavlov a li ser Refleksên Bi Merc dixwînim? Na. Vêca dipirsim: Ev kurrederê Joyce kî ye ku ewqas saetên min ên ji demên hişyarîyê dixwaze ji bo ku ez meselên wî yên zirrecêb, xeyal û şewqên wî ên derbirînê baş fahm bikim, tevî ku tenê çend hezar saetên min ji wan demên ne di xew de mane?

Ez bi xwe wiha dibînim. Belkî tu heq bî û ez ji binî de neheq bim. Berhema te azmûneke gelekî gelekî mezin e û ez ê tehdê li xwe bikim bo ku wê ji şiroveya hilweşîner yan sînorker rizgar bikim. Bawermendên wê hene û li pey diçin. De bila xêrê jê bibînin. Ê min ji bo min daweyeke mirî ye.

Silavên germ ji te re Joyce! Ne ez êdî dikarim li pey ala te werim ne tu dikarî li pey a min werî. Lê dinya mezin e û dibe ku em herdu jî şaş bin.

Bi xatirê te,
H.G.Wells



Çar sal berê Letters Of Noteê di hejmara xwe ya Çiriya Paşîn de du nameyên balkêş weşandin. Herdu name jî, di dawiya salên 1920î de, ji James Joyce re hatibûn şandin.

Îro, Ne Sibê

CIWANMERD KULEK

Hevalê min got, "Nivîskarên kurd wekî pêxemberan dinivîsin." Berî ku ez bibêjim çima, wî bi xwe sebeb diyar kir: "Wekî wehîyek be bi fikra pêşî digirin û bêhna xwe fireh nakin ji bo fikra duyemîn were."

"Were çi?" vê carê mam şaş û min jê pirsî.

"Were a pêşî rast bike."

Dû re kete navê, lê pêre pêre meseleya me kurdan û nivîsandin ji bîr kir bi kelecaneke eşkere, dûr û dirêj, qal kir ku çima ji nav welatên rojhilatî pêxember û ji nav ên rojavayî fîlozof rabûne. Ê min jî, di ber bayê xeberdana wî re, hişê min çû ser kitêbên kurdî û keftûlefta nivîsandinê. Coş û baweriya her car a dema nivîsînê ku ji te we ye tu tiştekî herî nebînayî dikî, çongşkestin û sistbûna ku dema piştre lê vedigerî tu bi xwe ji xamîtiya wê bawer nakî û yan ji serî de dest pê dikî yan wê nivîsê virr dikî davêjî… Gotineke ku min gelek caran ji weşangerên kurd dibihîst hat aqlê min: "Filankeso nivîskarekî baş e ya rast, lê dema dinivîse pir lez dike," yan "Dibû ku berhemeke baş ji vê derketa eger bêvankes ewqas lez nekiribûya," yan jî "Lazim bû cardî bi bêhneke fireh li berhemê vegeriya û heta ji nû ve binivîsiya."

Rast e, berxaneya me hîn weku di qonaxa destpêkê a piştî çêkirina metbeeyê de be, hînê zêde zêde tişt hene em bikin bo ku xwe bigihînin îroroya welatên bi desthilat û pêşketî. Lê, ew ji me dipirsin, em ji xwe dipirsin, herkes dipirse: Çima ewqas lez û bez? Çima "bêhna me ne fireh e" li berhema ku em gelek caran ji reşika çavên xwe bêtir qîmetê didinê û hêviyê jê dikin? Nexasim piştî ku "ji ber ku em li hêviya aqlê paşî nasekinin û bi a aqlê pêşî dikin em tucarî ber xwe nabînin û bi ser nakevin," piştî ku kes kitêbên kurdî ji destê hevdu narevîne? Bo çi ev bêtebatî?

Xebateke statîstîkî tune ye bes bawer im îro hejmareke zêdetir a nivîskarên zimanê kurdî heye ji hejmara xwandevanên kurdî ên heştê sal berê, dema Celadet Bedirxan ji bo karibe Hawarê çap bike diçû ji Beyrûdê kaxez dikirî. Herwiha, şikeke min tune ye ku îro hejmara xwandeyên kurdî ji a dema Ehmedê Xanî jî zêdetir e. Awireke wisa tenê vê pêşberî me dike: Celadet Bedirxan jî û Ehmedê Xanî jî di wan herdu rewşên bi kêm-xwandeyên kurdî de hem mafdar hem jî neçar bûn ku hêvîyên xwe bispêrin pêşerojê û doza xwe bikin ji nifşên dahatîyê. Lewma wan bi rihetî karîbû bêhna xwe fireh bikin bo bi sedan salên li pêş. Ji bo herduyan jî milletek hebû û zimanê wî milletî hebû û wî milletî bi zimanê xwe diaxift, bes nizanibû bi zimanê xwe binivîse, bixwîne. Lewma cehd û xebat, hêvî û mereq ji bo wê bû ku ji axiftinê derbasî nivîsandinê bibin. Ev hêvîyeka nêzîktir, nermtir û hêsantir bû li beramberî hêvîya nivîskarên kurd ên îro. Çinku li Bakura Celadet û Xanî îroro pirranîya kurdan erê xwande ne lê zimanê tirkî çi bigire di jiyana wan de bûye zimanê sereke. Îcar pirs ev e: Eger milletek bi zimanê xwe zanibe kîjan rojê be dikare fêrî xwandin û nivîsandinê bibe, lê ku ew millet êdî bi zimanê xwe nizanibe? Hînbûna axaftinê jî bi qasî ya nivîsînê hêsan e? Bêguman na, eger te zimanek hebe tê wê maneyê ku dikarî wî biaxivî, illeh ne ew e ku tu zanibî binivîsî. Wê çaxê hêvîyên ji pêşerojê ji bo nivîskarê îro zehmettir dibin û wek tekerê erebeya di herrîyê de teqinîbe û ji neçarî bileztir di cihê xwe de badanaj bike, ew jî bêtir, hîn bêtir dilezîne ku ji wê teqnê xelas bibe.

Vêca nivîskarê kurd ê îro gava dinivîse di dilê xwe de hinekî jî bi vê pirsê diqilqile: Lê ku ziman bi temamî ji nav here? Û ew ihtîmal roj bi roj li ber çavê wî xurttir dibe, wê pêşeroja ku Xanî û Celadet hêvî dikir dûrtir biçe. Herçiya ku rû dide tesîrê li qelema wî dike lê di bergîya vê de qelema wî hîç hukmekî li ser rûdanan nake. Ji bo wî, li sedsala bîst û yekê pêşeroj vekişiyaye quncikeke dûrtir û tarîtir di gerdûnê de. Ew jî radibe fikr û ramanên xwe yên li ser sebeba vê rewşê bi tirkî dinivîse, çinku dizane ku ew ji bo îro tên gotin û sibê tune ne, tiştên ayidî wê rojê bi zimanê wê rojê, bi tirkî, dinivîse. Erê ew bi kurdî dihise lê bûyer bi tirkî rû didin. Çîrok, roman û helbestên xwe bi kurdî dinivîse çunkî dizane ew ji bo sibê ne, ancaq ew bigihêjin wê xala dûr û tarî a di gerdûnê de, wê dema, wê qonaxa ku hêvî û gumana wî ew e ku xwandevanên kurdî dê lê amade bin. Bi çavê serê xwe nebûn jî dîtiye û jidestçûna tiştê hebû jî dîtiye, wê fikar û waswasê dike ka gelo dê bi saxî û silametî bigihê sibê. Nasekine, dilezîne. Difikire ku eger sibero xewn û hêvîyên Celadet û Xanî bûn rastî, halê kurdan û kurdî yekcar baş bû, û berhema ku keramet û aqûbeta wê di wê siberojê de didît nehatibe nivîsandin? Neqediyabe? Nehatibe çap kirin? Nehatibe belav kirin? Helbet tebatî nayê. Ji xwe re bidin bala xwe, dawîya dawî amanc û xeyala wî ne ew e ku nemirîyê zeft bike, ew e ku kurdî nemire.

Lê vê dawîyê hesteke tîj, gelekî bi kurd û kurdîtîyê ve girêdayî û her roj ji nû ve dijî, xişûşiyeke dîtir dixe dilê wî: lê heke ew pêşeroj hîç tune be? Bîr û bawerîya ku pêşerojek heye lê dûr e teletel şûna xwe dihêle ji vê bedgumanîya xasûk re. Vêca lez û beza maratona ku ji bo pêşerojeka dûr pêwîst bû vediguhere trîatlon (pêşbaziya di sê cureyên werzişê de –bazdan, avjenî, bisiklêtajotin)a ji bo îro. Wate: Kurdî, îro, ji bo îro. Berê min li malê, di rê de di ber xwe de dibişirim gava gotineke hevalê min tê bîra min: "Bêmane ye mirov 'wekî' filôzofan be, 'wekî' pêxemberan be."

Ji 2004an, ku cara pêşî min dest bi nivîsandina kurdî kir, heta îro min heft kitêb bi kurdî nivîsandin heft kitêb jî ji zimanên cuda wergerandin kurdî. Di nav wan de ên ku min lez kirin jî hebûn, ên ku ez li derîyê weşanxaneyan li benda wan sekinîm jî. Di hemûyan de jî bi qasî ku min fikar û waswasa îro dikir, min hêvî û gumana siberojê jî dikir. Wekî her insanê cahil (gênc) û xeşîm ku ji wan we ye ji hedê xwe pirtir tişt jiyane û dîtine, êdî wek berê xema siberojê naxwim; doz û hêvîyê ji îro dikim. Bila ev jî baskê sêyem ê trîatlona min be: Ligel romannivîsîn û wergerandinê, îcar jî nivîsên rojnameyî li vî quncê hanê. Pirranî bi kurdî li vir, carina bi tirkî li rexê dî. Hem bi nivîsên stûnê, hem bi amadekirina hin nûçeyên kulturî û civakî. Eger rojnamegerî nehêle ez wek berê romanan binivîsim û kitêban wergerînim bila xwandevanên min ên wê pêşeroja dûr yan jî tune li min negirin. Herçî ên niha ne, îro bixwînin, sibê di bîr bînin.

Dîroka xişlên kurdî

Her ji zû ve zêr û zîver û kelûpelên din yên xwexemilandinê jibo jinên kurd bûye beşek ji cilûbergên wan.
Xişlên (guhar, gustîlk, bazin, xizêm, gerdanî, fîrûze ... hwd) herî baş û bêhempa yên dîrokê jî ji dema medan bigire heta Sasanîyan yên jinên kurd e. Peykerê Bizina Bi Bal û Cama Hesenlû, mînakên herî xweşik û balkêş yên hostekarên wê serdemê bûn ku hêj bêmînak in.
Wêje, çand û şaristanîya Medan bi pêşengê şêwaza hunerên pêş Îslamê tê nasîn. Nexşên li ser dîwarên şikeftan, wê rastiyê diselmîne ku mirovên pêşîn bi zêr û ziver û alavên cûrbicûr, xwe xemilandine. Di wan nexşan de kolye (milwanke) û bazin (destbend) tên dîtin.
Berê di dîroka Kurdistanê de cilûbergê zilaman bi kolye û bazin û xenceran dihat xemilandin. Li ser bazinan nexşa şêr an xezalê hebûn. Hinek caran jî nexşên du teyrên nêçirvan, dibûn bazinên zilaman. Li gorî nivîsên dîrokî di serdema Medan de û du hezar sal berîya zayînê, çêkirina aksesûaran (zêr û ziver), pîşeyekî pêşkeftî bûye.
Di serdema Sasanîyan jî de afrandina aksesuarên ji zêr qiymeta xwe hebûye. Li gor gotinên Will Dorant, Girschman û Chardine; berîya Îslamê çêkirina aksesuar û berhemên xemilandinê yên ji zêr û kevir û alavên sirûştî ji caran zêdetir geş bûye û çînên dewlemend, xişl û kêlûpelên xemlandinê dikirin beşek ji cilûbergên (poşak) xwê.
Padîşahan jî gîringiyeka mezin dane zêr û ziveran û Hurmuzê Yekem û Xusrewê Duyem, ewqasî girîngî aksesûar û kelûpelên xwexemlandinê dane ku dîroknigar pê matmayî mane. Dîroknigarê Bîzansî Tofîlaktos û yê ereb Se'albî, pesnê tac û textê wan padişahan dane û hosteyên wê demê bi hosteyên herî baş li qelem dane. Ew cilûbergên ku jinên kurd ku niha li xwe dikin, gelekî dişibin wan cilûbergên bav û bapîrên me ku di serdema medan de li xwe dikirin. Her dema behsa cilûbergan bihête kirin medan wekî mînak dihêne nav birin.
Kurdistanê ev hunera dîrokî ya pêş Îslamê, heta niha parastiye û xişlên herî xweşik li Sine, Urmiye û Kirmanşah dihêne çê kirin. Di dawîya sedsala sêzdehan û destpêka sedsala çardehan de li Kurdistanê bi awayekê nû dest bi çêkirina xişlan dihête kirin ku yek ji taybetmendîyên wê melîlekarî bû bi awayekê gelekî baş û kêmwêne dihête çê kirin. Kevirê fîrûze di vî warî de li ber çavan e. Lê kevirên din kêmin. Di awayê nû yê çêkirinê de kevirê fîrûze li pêş e. Çunkî bawerîya wan bi sîhrawîbûna wî kevirî hebûye. Li ser wan xişlan, nexşên gul, pel, masî û nexşên geometrîk zêdetir dihêne dîtin. Gerdanî û xiftî ji kevirên çargoşe dihatin çê kirin û bi diravên Osmanlî û Ewrûpî dihatin xemilandin.
Xiftîyên Sine jibo cejn û hilkeftan çargoşe bûn û bi aksesuarên biçûk wekî masî dihatin xemilandin. Bazin bi diravên Brîtanî, stêrk û heyvê dihatin xemilandin. Guhar bi awayê melîle, heyv, qaz yan morîkên zêr bûn.
Piştêna jinan bi nexşên gul û bi awayê osmanî bi kanzayên zîv û zêr dihatin nexşandin.
Li Mûzexaneya Niştimanî a Îranê, xişlên berîya Îslamê dihêne parastin. Zêdetir ji 40 xişlan ku dîroka wan vedigere navbera du hezar sal berîya zayînê heta Sasanîyan û li navçeyên Urmiye, Loristan, Girê Hesenlû, Zîwîye û Hemedanê hatine dîtin li wê mûzexaneyê dihêne parastin û pêşandan.

Tiştên Balkêş

We dizanibû?

-Hîtler 129 salan piştî Napolyon ji dayik bû, piştî ku Napolyon bû desthilat bi 129 salan ew jî bû desthilat, piştî ku Napolyon Rûsya dagir kir bi 129 salan wî jî Rûsya dagir kir û piştî Napolyon bi 129 salan ew jî şkest û têk çû.



-Hejmara plaka otomobîla ku arşîduk Franz Ferdînand têde hat kuştin û li ser vê yekê şerê cîhanê ê yekemîn derket A 111 118 bû. Rêkeft Agirbesta ku ev şer bi dawî anî jî di vê tarîxê de pêk hat: 11.11.18

Li gor nûçeyeke Life Magazineê a sala 1967an di 1895an de tenê du otomobîl li seranserê dewleta Ohioyê (DYA) hebûn û ev herdu otomobîl bi qezayekê li hev qelibîn.
-Stalin, Hitler û Franz Josef, ku ji mirina 80 milyon mirovî berpirsiyar in, di heman demê de li Viyanayê jiyane.

Hîtler 129 salan piştî Napolyon ji dayik bû, piştî ku Napolyon bû desthilat bi 129 salan ew jî bû desthilat, piştî ku Napolyon Rûsya dagir kir bi 129 salan wî jî Rûsya dagir kir û piştî Napolyon bi 129 salan ew jî şkest û têk çû.